# ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ 3

*Ev pirtûk ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdê ya KCK"ê û Qomîteya Zanist û Ronakbiriyê ve, weke pirtûka waneyêhatiye pejirandin.*

# *AMADEKARÊN PIRTÛKÊ*

***Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn***

M. Elî DEMİR, M. Şîrîn ÇETİN, Mazlûm TEKİN, Îsmet YALVAÇ, Hewar GUNGEN, Sedîq BENEK, Selamet ERDOGAN, Emîne BULUT, Hesin DEMİR, Sofî SİDAR, Mihemed KARA

***Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek taybet ji nûnerên parçeyên Kurdistanê, ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin.***

***Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan***

Mizgîn EGÎD, Arşek Baravî, Mazlum TEKİN, M. Şîrîn ÇETİN, Birahîm Xelîl, Laleş Ferqînî, Dijwar BOTAN, Ednan HESEN, Mustafa OSMAN, Hisên CIZÎRÎ

***Redaksiyon***

***Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan*** bi alîkariya Bahoz BARAN

***Wênexêziya hinek wêneyan***

Muazzez FİLİZ
Cengiz KARA

***Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan***


Bedredîn OY
Merwan YAMAN

*Çapa pêşîn: 1999*
*Çapa nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





*“Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin.”*

# NAVEROK

**BEŞA 1** ........ **8**

AZAD Û DIBISTAN ........ 8
SIRÛDA ALFABÊ ........ 10
ZAROKÊ XEMSAR ........ 13
*MIJARASERBEST* ........ *16*
EZ KEÇEKE BIÇÛK IM ........ 16
MORIYA BIÇÛK ........ 17
JIYAN ........ 19
WATEYA HELBESTÊ BI KURMANCIYA JORÎN ........ 20
PAYÎZ HAT ........ 21
EZ PIRTÛK IM ........ 22
*MIJARA SERBEST* ........ *24*
PÊKENOK ........ 24
TEST 1 ........ 26

**BEŞA 2** ........ **27**

TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ ........ 27
HEVALBENDÎÇIQAS XWEŞ E ........ 29
*MIJARA SERBEST* ........ *30*
HEVALNO ........ 30
RÛMETÊN ME ........ 31
SIBATA REŞ ........ 34
WERHAYÊ WERHAYÊ ........ 35
KELEŞÊRÊ HOLNENAS ........ 36
RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE ........ 38
PIŞÎLE ........ 41
PAQIJIYA DERDORÊ ........ 43
PERPEROK ........ 45
TEST2 ........ 47

**BEŞA 3** ........ **48**

GURÊ ÇAVBIRÇÎ ........ 48
PIRTÛK ........ 51
ÛLAMVAN Û KEÇIKA BIÇÛK ........ 53
YEKITIYAÇÛKAN ........ 56
PENDÊN PÊŞIYAN ........ 57
NAME JI BO DAPÎRÊ ........ 58
QUTABÎ ........ 61
BEFIRBARÎ ........ 63
VIZ VIZ XATÛN ........ 66
ZERDELÎ ........ 69
HEŞTÊ ADARÊ ........ 71
AZADIYAÇANDÛ ZIMAN ........ 73
TEST 3 ........ 74

**BEŞA 4** ........ **75**

DIRAVÊN AMADE ........ 75
ZAROK Û LÎSTOK ........ 77
NALÎNA KURDISTANÊ ........ 80
XWENDEKAREKÎJÎR ........ 83
DARA GÛZÊ ........ 86
GULA DEVLIKEN ........ 88
ÎKLO DÎKLO ........ 91
ZAROK Û GUL ........ 92
BIHAR ........ 95
EHMEDÊXANÎ ........ 96
VEGERA LEGLEGAN ........ 99
NEZANÎ ........ 102
DAR ........ 103
TEST 4 ........ 105

**BEŞA 5 ........ 106**

MEHABAD ........ 106
XIFŞÊ ........ 108
*MIJARA SERBEST ........ 111*
RÛVÎ Û GUR ........ 111
ROJBÛNA RÊBER APO ........ 113
*MIJARA SERBEST ........ 115*
BILBILÊN DI RIKEHAN DE ........ 115
KULÎLK ........ 117
LEHÎ ........ 119
XWENDIN ........ 121
ALÎKARÊNCOTKARÊNZINDÎ ........ 123
HEZKIRINADAYÎKÊ ........ 126
KEW Û MIRÎŞK ........ 128
TEST5 ........ 130

# BEŞA 1

## AZAD Û DIBISTAN

Azad serê sibê zû şiyar bû. Çû destşûkê dest û rûyê xwe şûştin. Taştê xwar. Diranên xwe firçe kirin. Cil û bergên xwe yên nû li xwe kirin. Bi baldarî amûrên xwe yek bi yek di çentê xwe de bi cih kirin. Xatir ji dayîka xwe xwest, berê xwe da dibistanê.

Azad pir bêriya dibistan, heval û mamosteyên xwe kiribû. Bi lez dimeşiya. Dixwest wan zû bibîne. Pir bi kelecan bû.

Dema ku ber bi dibistanê ve diçû, rastî hevala xwe Rojînê hat. Silav dan hev û bi hev re çûn dibistanê.

Hêdî, hêdî bexçê dibistanê bi xwendekaran tijî bû.

Hevalên xwe yên sala borî dîtin. Hevalên wî jî hemû wekî wî bi coş û kelecan bûn.

Zengilê lê da. Xwendekar li hev civiyan û ketin rêzê. Refên wan yên nû ji aliyê mamoste ve hatin diyar kirin. Paşê her kes bi rêk û pêk çûn refên xwe. Azad jî çû refa xwe ya nû. Piştî çend xulekan, mamoste hat refê.




Mamoste:

-Roj baş zarokno! Sala nû ya hîndarî û perwerdê li we pîroz be. Ez bi dîtina we pir dilxweş im. Min bêriya we kiribû.Piştî axaftina mamoste, Azad û hevalên xwe li çepikan xistin. Rêzdarî û dilxweşiyên xwe pêşkêşîmamoste kirin.

## WATEYÊN PEYVAN

**Perwerde:** Fêrdarî, têgihandin, xwehînkirin
**Kelecan:**Xiroş, can, peroş, heyecan
**Xwendekar:**Şagirt
**Xule:**Hurde

## EM TÊBIGIHIN


1-Azad ji bo çi sibê zû rabû?
2-Azad serê sibê rabû çi kir?
3-Bêhndana we ya havînê çawa derbas bû? Bi çend hevokan binivîsin.

## DESTÛRÊN ZIMAN

Her peyvek ya li jêr di nav hevokekî de binivîsin.
Kelecan, Hîndarî, Perwerde.

***Têbînî***: Mijara li jor ji aliyê mamoste ji xwendekaran re tê xwendin. Pişt re tişta ji gotinên mamoste fêr bûyîn ew jî tînin ziman

# SIRÛDA ALFABÊ




Bijî bijî Kurdistan
Rê girtî, me biçûkan
Va em diçin dibistan
Ji bo hînbûna ziman

Zimanekî şîrîn e
Ciwan û hingivîn e
Abeya wê bixwîne
Sih û yek tîp bi cî ne

Heşt tîp hene şiyar in
Navê wana bideng in
Bîst û sisê xewar in
Tîpên girs û bêdeng in

Dibistana têkoşer
Hînbûna wana jiber Kar
û xwendin, zanewer
Mamostê me Dilawer

**a-e- ê- i- î- o- u- û**

**b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m-**
**n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z**

# WATEYÊN PEYVAN

**Bêdeng:**Tîpên dengdar
**Bideng:**Tîpên dengdêr
**Têkoşer:** Xebatkarê dozê

# EM TÊBIGIHIN

1- Xwendekaran li dibistanê fêrî çi dibin?
2- Çend tîpên dengdêr û dengdar hene?

# DESTÛRÊN ZIMAN

***1- Di zimanê me de 8 tîpên dengdêr hene. a- e- ê- i- î- o- u- û***
***2- Di zimanê me de 23 tîpên dengdar hene. b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m- n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z***
***3- Ji rêzepeyvên li jêr kîjan hevok e?***

Rêgirtî
Va em diçin dibistanê.
Ciwan û hingivîn

*Peyv û rêzepeyvên ku wateyekê tam didin diyarkirin, jê re* ***hevok*** *tê gotin.*

Hevoka li jor lênûsa xwe binivîsin û di dawiya wê de hêmaya xal ji bîr nekin.

***4- Valehiyên li jêr dagirin.***

.... girtî me biçûkan
Heşt tîp ....şiyar in
Bîst û sisê ..............

# HÎNDARÎ

1- Dema mamoste helbest xwend, li ser van xalan baldar bin.

- Li kûderê kêm û li kûderê zêde radiweste?
- Dengê xwe li kûderê bilind û li kûderê nizim kir?

2- Helbestê bi awayekî bêdeng bixwînin, naveroka helbestê fêr bibin.

3- Helbestê bi awayekî rast û bideng bixwînin. Dengê xwe baş bipîvin.

4- Dema hûn dixwînin bila di navbera çavê we û pirtûkê de qasî 30 santî metre(cm) dûrbûn hebe. Ji bo tenduristiya çavê we, ev pir base.

# ZAROKÊ XEMSAR

Zarokekî xemsar hebû. Zarokê xemsar cilên ku ji xwe dikirin davêt erdê. Pirtûkên xwe li holê ji bîr dikirin. Li ku derê dilîst, pêlîstokên xwe li wir dihişt.

Rojekê, tiştên wî yên belawela, di navbera xwe de dipeyivin.

Cil:

- Tû çima heya niha li virî? Ma divê tu niha ne li dibistanê bûya?

Belê. Mixabin zarokê xemsar dema ku çû dibistanê, ez li vir hiştim.

Cil û gore jî, ji zarok bêzar bûbûn.

Şal:

Binêrin hûn dizanin em ê çi bikin? Zarokê xemsar bilêta basê di berîka min de ji bîr kiriye. Em hemû bi hev re li basê siwar bin û ji vir biçîn.

Tişt miştên wî, bi hev re dibêjin:

Erêêê!

Basa ku lê siwar bûn, ew birin geryangeheke şîn.

Li wê derê bi gog û veşartokê lîstin. Di nav şînatiyê de xwe gevizandin.

Ber bi êvarê ve dîsa li basê siwar bûn û zivirîn malê. Her yek çû cihê xwe.

Zarok ji dibistanê hat. Dema rewşa tiştên xwe dît.

Got: Xwezî min ew rakiribûyan da neketibûma vê rewşê.

Zarokê xemsar jiwê rojê şûn de cil, pirtuk û pêlîstokên xwe, li erdê nedihiştin.



## WATEYÊN PEYVAN

**Bas:** Otobûs
**Geryangeh:**Geştgeh, seyrangeh, park
**Gevizandin:**Xwe di nava şînatiyê de gêrkirin

## EM TÊBIGIHIN

1 -Çi tişt ji zarok bêzar bûn?
2 -Tişt miştên wî bi çi çûn gerê?
3 -Qirêjî û belavbûna tiştan bandoreke çawa li zarok kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

*1-Ji endamên ziman yên herî biçûk û xwedî wate re **peyv** tê gotin.*

2-Di her hevokeke li jêr de çend peyv hene?
***-Zarokekî xemsar hebû. -***
***Tû çima heya niha li vir î?***
***-Zarok ji dibistanê hat.***
3-Her yek ji peyvên li jêr di nava hevokekî de bi kar bînin.
***roj, gok, cil***.

# HÎNDARÎ

- Mijara destpêkê bêdeng, piştre jî bideng bixwînin.
- Di dema xwendinê de arambin û rast rûnin.
- Hûn van xalên li jêr ber çavan digirin?

Pirtûk û lênûsên xwe berg bikin. Bi awayekî paqij bi karbînin.Wan neqetînin û neqermiçînin. Pirtûkên xwe xêz nekin.
Heman baldariyê ji bo tiştên hevalên xwe û dibistanê jî nîşan bidin.

- Dema hûn dipeyîvin hay ji van xalan hebin.

***-Di destpêkê de baş bihizirin, paşê baxivin.***
***-Nêrînên xwe bi rêk û pêk bidin têgihandin***
***-  Peyvên rast bêjin.***
***-Hevokên kurt saz bikin***
***-Bi dengekî asayî bipeyvin.***

# MIJARASERBEST

## EZ KEÇEKE BIÇÛK IM

Ez keçeke biçûk im
Navê min kirin Zozan
Keçek wek tev keça me
Ji Japan ta bi Espan
Pirtûk tevde dibêjin
Welatê te Kurdistan
Ez jî, paye dibêjim
Bijî dayik niştiman

Di xewnan de dibînim
Siyabend, Memê Alan
Xanî, Koyî, Bedirxan
Babek û Feqê Teyran
Ew in bav û kalên min
Keçek im ji Kurdistan
Paye, serbilind im ez
Bi dayika niştiman



# MORIYA BIÇÛK

Moriya Biçûk sibê zû şiyar dibe. Dibîne ku hemû xwîşk û birayên wê çûne. Ji xewê rabû û bêhnek stend. Rabû çû dest û rûyê xwe şûşt.

Êdî ji bo destpêkirina jiyana xwe ya rojane amade bû. Wê rojê dibistan tune bû.

Ji ber vê yekê di moristanê de bi tenê mabû. Piştre ji moristanê derket, rastî moriyên diçin kar hat. Demekê wê li çûn û hatina moriyan temaşe kir. Piştre kete rê.

Pêşî berê xwe da gulistana ku moriyên biçûk lê dilîstin. Li wir bi xwîşk û birayên xwe re lîst. Gelek şadbû.

Piştre dest bi temaşekirina moriyên ku dixebitin kir. Di wê demê de moriyeke mezin bi awayekî devliken jê pirsî:

-Tû jî dixwazî bixebitî?

Moriya biçûk dikeve xirûşê.

-Belê.

Moriya mezin:

-Jixwe çûna dibistanê jî karekî girîng e.Lê dema dibistan ket betlanê, tû jî dikarî li gel me bixebitî. Moriya Biçûk:



-Ez dixwazim li ser rûyê erdê bixebitim.

Moriya Mezin:

-Baş e. Her morî li gorî hêza xwe kar dike. Di jiyana moriyan de hevkarî heye.

Moriya Biçûk:

-Ez tê gihîştim.

Moriya Mezin:

-Dema tû derketî ser rûyê erdê tû yê baştir tê bigihêjî.

Mirov jî weke moriyan, di nava karên cur bi cur de dixebitin. Ev parvekirina kar dibe sedema ku astengî dernekevin, kar bê berdewamkirin.

## WATEYÊN PEYVAN

**Morîstan:** Kun mêrî, cih ûwarê moriyan.
**Xirûş:**Kelecan, heyecan
**Hevkar:** Alîkar, karkirina bi hev re

## EM TÊBIGIHIN

1- Bûyera di mijarê de, li ku derê derbas dibe?
2- Moriya biçûk berî ji male derbikeve çi kir?
3- Moriyên biçûk di gulistanê de çi dikirin?
4- Li gor nivîsînê taybetmendiyên di navbera morî û mirovan de têne dîtin çi ne?

## DESTÛRÊN ZIMAN

*Ji her sererêzekê re**bend**tê gotin.*
Di her bendekê de jimara hevok û xalan ne wekhev in.

## HÎNDARÎ

-Parvekirina karê malbata xwe bidin diyarkirin. Bi çend hevokan binivîsin.
-Di nivîsandinê de ji çêlika moriyan re dibêjin moriya biçûk.
-Navên çêlikên tebayên jêr hîn bibin û binivîsin?
Mehîn, mî, bizin, çêlek, mirîşk, hirç, ker

# JIYANA MIN



Jiyana min bi ewleye,
Zû radibim dora meye.
Dema ez destê xwe dîşûm,
Xwarina li berm eye.

Dema xwarinê ex dixwim,
Di gel hevalan kon dibim.
Vine bi wan re par dikim,
Nexweşiyên derbas dikim.

Pişt re em diçîn dibistan,
Dibînin em wanên dostan.
Dilê me wek bax û bostan,
Her bihare ne zivistan.

Dema li male vegerin,
Bi dê û bavan re dikenin.
Roj tev wisan derbas dibin,
Em xwendekarên bîrberin.

M.M.Şirîn Çetîn.

# WATEYÊN PEYVAN

**Bi ewle:** dibin parastinê de

**Dor:** Sira,wext

**Vîn:** heskirin

**Par:** behir,pay

**Bax:** rez, cihê mêw tê hatî çandin

**Bostan:** Erdên avê yê em hemû cûrên şînatî tê de diçînin.

**Bîrber:** kesên ji ber xwe ve tiştan tê digehin.

# PAYÎZ HAT

**Hatî payîzeke sar**
**Werya hemû pelên dar**
**Tevê rojan kin bûne**
**Teba li hev civîne**

**Hewa jî pir sar bûye**
**Baranê destpêkiriye**
**Nêzîk bûye zivistan**
**Zarok diçin dibistan**

***Penaber***




# EZ PIRTÛK IM

Ez pirtûk im. Bi wêneyên rengîn dagirtî me. Çîrokên pir xweş di nav rûpelên min de hene. Her beyanî dema ez ji xew radibim bi dilkovanî radiwestim. Ez temaşe dikim; wê kî min bixwîne û zanînê ji min bigire. Ji bo min mayîna di nava refikên toz û gemarê yên pirtûkxanê de pir zor e ku ez bînim ziman.

Gelo hûn dizanin ku em pirtûkên ji wêne û nivîsînan dagirtî, ji kaxezan çêdibin? Kaxez jî, beriya sedên salan bi hewldanek mirovan hatiye dîtin. Berê ez dareke pelşîn, di nav daristanek mezin de dihejiyam. Hinek mirovên ji „Saziya Daristanê" hatin û biryara birîna min dan. Ez birîm û mohr kirim, birim kargeha kaxezan. Ez di gelek karaninan re derbas kirim. Ez di destpêkê de bûm hevîrê kaxezan. Piştre bûm kaxeza ku hûn dizanin. Di pey wê re jî, di çapxanê de li ser min wêne hat xêzkirin û nivîs hat nivîsandin.

Bi vî awayî ez bûm pirtûk û gihîştim ber destê we.



## WATEYÊN PEYVAN

**Beyanî:**Sibeh
**Dilkovan:**Dilbixem
**Mohr:** Bi pîvan dar birîn, ji her qetê bi pîvan hatî birîn re tê gotin.
**Çapxane:** Cihê çêkirina pirtûkan.

## EM TÊBIGIHIN

1- Bûyerên di mijarê de kî radigihîne?
2- Pirtûk her beyanî bi dilkovanî li benda çi dimîne?
3- Heya darek dibe pirtûk, di kîjan karanînan re derbas dibe?

## Rêziman

Sergotara vê mijarê ji çend peyvan pêk hatiye?
Ew bi tîpên mezin, yan yên biçûk hatiye nivîsandin?
Di mijarê de çend bend hene?
*Ji sererêzekê heya sererêzek din re* ***bend*** *tê gotin.*
Her destpêkirina bendekê bi tîpa mezin tê nivîsandin. Ji bo jimara bendan bê dîtin sererêzan bijimêrin.
Hevokên kîjan bendê kêmtir in?

## HÎNDARÎ

-Dema hûn dixwînin van tiştan berçav bigirin: -Bi goşê pel ê milê rastê bigirin û bi qulibînin. Pelan bi tiliyên şil nequlibînin û nequrmiçînin.

# MIJARA SERBEST

## PÊKENOK

Dema ku Zîlan ji dibistanê zivirî, dayîka wê di pêjgehê de bû. Bi lez û bez çû ba dayika xwe. Dayika Zîlanê rewşa wê asayî nedît, lê tênegiha ku çi bi serê wê hatiye.

- Keça min xêr e! Tû ewqas bizdiyayî? Zîlan:

- Îro! Dayê îro dema ku em ji dibistanê dizivirîn, yek ji trombêlê ket. Her kes bi wê kenî, lê ez nekeniyam.

- Dayik;

- Bijî keça min! Bi kesên ku tiştên wiha têne serê wan, kenîn şerm e. Gelo ya ku ji trombêlê ket, kî bû?

Zîlan:

- Ez bûm dayê!



## NAVÊN ZINDIYAN DI XAÇPIRSÊ DE DIYAR BIKIN

kîso

şêr

kêvroşk

mêş

sîvorî



| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| k | î | s | o | w | i | g | m |
| ê | e | i | h | e | d | e | ê |
| v | o | v | a | n | ê | r | ş |
| r | a | o | î | r | d | a | a |
| o | p | r | h | b | l | b | r |
| ş | ê | î | ê | j | c | ê | e |
| k | r | t | z | r | o | t | t |
| ş | ê | r | o | a | y | û | n |
| r | r | a | m | b | n | n | n |

# TEST 1

**1- Wateya peyva "perwerde"yê çi ye?**

a) karkirin
b) şerkirin
c) fêrbûn

**2- Di zimanê Kurdî de çend tîpên dengdêr hene?**

a) heşt
b) heft
c) neh

**3- Ji endamên ziman yên herî biçûk û biwate re çi tê gotin?**

a) nav
b) peyv
c) tîp

**4- Nivîskarê helbesta "JIYANA MIN"ê kî ye?**


a) Rizgar Rastî
b) Nalî
c) M.M.Şirîn Çetîn

**5- "Xwendekar ronahiya pêşerojê ne." Li dawiya vê hevokê kîjan hêma tê bikaranîn?**

a) xalbêhnok
b) sêxal
c) xal

# BEŞA 2

## TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ



Rojê ez tim dixwînim
Helbestan jî dihûnim
Dema saet dibe şeş
Dilê min pir dibe xweş
Banî dikim hevalan
Em jî weke ciwanan
Herin darî nûçên xweş
Da em jî pê bibin geş
Dema ew dest pê dikin
Em zarok ne hindik in
Hin zarokên pir nezan
Nexweşiya çêdikin
Hinek zarokên malan
Rûdinin wek delalan
Li nûçan pir guhdar in
Ne wek par û pêrar in

## WATEYÊN PEYVAN

**Darî:** Temaşe

## EM TÊBIGIHIN

1-Em encamek çawa ji vê helbestê digirin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di hevoka "*Banî dikim heval**an***" de peyva "*heval**an***" navekî pirjimar e.

Dema em li ser "***heval***" pêveka "***an***"ê zêde dikin, navê yekjimar dibe pirjimar.

Navên li jêr yên yekjimar bikin pirjimar.

**Zarok, mal, ciwan, dibistan**

## HÎNDARÎ

1- Divê hûn kengê li televîzyonê temaşe bikin û kengê nekin? Şîrove bikin.

2- Dema hûn şîrove dikin, pêwist e hûn li gor van xalan tev bigerin:

- Tiştên ku hûn dixwazin bêjin, destpêkê bihizirin û piştre bêjin.
- Ji mijarê dernekevin.
- Gotinên hevalên xwe yên dipeyvin nebirin.
- Ji hevalên xwe yên weke we nahizirin nexeyidin.
- Nêrinên xwe, bê ku hûn hevalên xwe bişkênin bêjin.

3- Dema hûn li televîzyonê temaşe dikin, li gorî van tiştan tev bigerin.
Divê mirov du-sê metrayan ji televîzyonê dûr be.
Divê em dengê televîzyonê bilind nekin.

# HEVALBENDÎÇIQAS XWEŞ E

Azad di refa sêyem de dixwend. Rojekê Azad li bexçeyê dibistanê dilîst. Ji nişkan ve zarokek derket pêşberî wî û herdu li hev ketin. Azad li erdê ket û serê wî şikest. Serbest zû rahişt destê wî, destmala xwe ji berîka xwe derxist, danî ser birîna wî û ew bir odeya mamosteyan. Li wir mamosteyan birîna wî derman kir. Piştre Azad çû refa xwe. Azad dema ku rûnişt spasiya Serbest kir.

Ji wê rojê û pê ve Azad êdî hîn bêhtir ji Serbest hes kir û wî jî her tim alîkariya hevalên xwe dikir. Heke li refê amûrên kesekî kêm bûna, Azad amûr ji çenteyê xwe derdixist û dida wan. Ji bo vê jî, wî her dem amûrên zêde bi xwe re dibirin refê.

Belê heke alîkarî û hevparî hebe, hevaltî çiqas xweş e. Ma ne wisa ye?



# MIJARA SERBEST

## HEVALNO

**Guh bidin min hevalno**
**Her bixwînin delalno**


**Bi zimanê diya xwe**
**Huner bikin karê xwe**

**Zarok bi tev keç û kur**
**Hev bigrin bir bi bir**

**Dengê xwe hûn bikin yek**
**Govend bigrin lek bi lek**

**Çanda xwe baş bizanin**
**Bê dilman û bê gazin**

**Bi qêrîn û bi awaz**
**Bi evîn û bi daxwaz**



# RÛMETÊN ME

Rojekê Dayê Gulê karê xwe qedand û bêhna xwe vekiribû. Lê, di nav êş û keseran de xuya dibû. Zarokên wê Dilvîn û Rojhat li rex wê rûniştibûn. Vê rewşê bala Rojhat kişandibû.

Rojhat:

- Dayê, ji ber çi tû ewqas dihizirî, bi êş û keser xuya dikî?

Dayê:

- Lawê min, ma ez nehizirim wê kî bihizire.

Rojhat:

-Rast e dayê, ez rewşa te dibînim, gelek zor e. Lê di her aliyan de berxwedan pêwîst e.

Dayê:

- Lawê min, me gelek li berxwe da, ked û şehîd jî dan.

Rojhat:

- Dayê wateya “berxwedan, ked û şehîdan çi ye?”

Dayê:

- Di bin rêveberiya „Têkoşîna Azadiya Kurdistanê‟ de bi salan e têkoşîneke bêhempa tê dayîn. Di vê têkoşînê de, bi hezaran gerîlayan cih girt, gelek ji wan birîndar bûn û gelekan jî jiyana xwe ji dest da. Ji yên birîndar re gazî ji yên ku jiyana xwe ji dest dayî re şehîd tê gotin. Di dîrok û jiyana gelan de tiştên herî bi rûmet şehîd û piştre jî gazî ne.



Ji kar û xebatên bi nirx û rûmet re ked tê gotin. Bersiva berxwedanê jî ya herî rast heval Mazlûm DOXAN daye. “Berxwedan jiyan e!”

## WATEYÊN PEYVAN

**Êşûkeser:**Jan û keder
**Rêveberî:**Serkêşî
**Dîrok:** Mêjû, tarîx

## EM TÊBIGIHIN

1- Dayê Gulê û Rojhat li ser kîjan mijaran peyivîn?
2- Tevgera Azadiya Kurdistanê çi afirand?
3- Li gorî vê mijarê ked tê çi wateyê?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1 - Di hevokên jêr de alavên binê wan hatî xêzkirin bi serê xwe wateyekê nadin. ***(û-ku-jî** Ji van dengan re dibêjin**gihanek.***
Rêzan **û** Gulê bi hev re diçin dibistanê.
Pêwîst e hûn baş guhdarî bikin **ku** hûn têbigihin.
Ez gelek şabûm ku em **jî** xwediyê van rûmetên herî pîroz in.
2 - Her yek ji peyvên li jêr di hevokekê de bikarbînin.
***Berxwedan, şehîd, ked***

## HÎNDARÎ

1-Nivîsandina we li jor xwendî bi çar-pênc hevokan şîrove bikin?
2-Ji bo pîrozkirina cejnên netewî, hûn di dibistanê de çi amadekariyan dikin?


## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

### Tîpên Mezin

A- B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z.

### Tîpên Biçûk

a- b- c- ç- d- e- ê- f- g- h- i- î- j- k- l- m- n- o- p- q- r- s- ş- t- u- û- v- w- x- y- z.



# SIBATA REŞ

Vê sibatê dîsa li me tarî kiriye diyar
Li dinyayê em gerandin kes neda me cih û war
Çûkan hêlîn çênekirin ji ber vê xedra neyar
Ji dengê lingan erd hejî, li her der qîr û hewar

Li sibatê ji qehran re gul û kulîlk çilmisîn
Xwina keç û xortên Kurdan li damaran qerisîn
Zarokên şîrmij jî bi vê sitema dijmin hesîn
Ger bibin yek ji bo azadiya serok em bes in

Ev sibat e li dîrokê mîna kêvroşka beş e
Ramanên me serûbin kir ceger ji qehran reş e
Gelê Kurd tev rabûn ser xwe êdî wiha nameşe
Hêviya me serokê me dê bîne rojên xweş e

**Penaber**



# WERHAYÊ

Werhayê werhayê
Kulîlka du tayê
Bejna xildexayê
Xildexa bilbil e
Hewar kir Mûsil e
Mûsil der bû der bû
Hemû li çarê wer
bû Çara mîr melek
e Avêtî zîrek e
Zîrek xweş e xweş e
Bivir kir kiras e
Kirasê memê ye
Li bejna kekê ye
Kekê min çû sûkê
Kirî cilên bûkê
Bûka me Kurdane
Ser serê tîpan e
Tîpan ve qeliştî
Şêro nêvde kuştî
Şêro hak e mak e
Şivaka zêrîn e Li
pişta Behdîn e
Behdînê Hekarî
Serê kumî tarî
Çiyawo çiyawo
Nêriya palvedawo
Nêriyê keresîs e Ji
çengan xîsexîs e
Zozan xweş Bedlîs e
Pezkê bavê min e
Li mêrga mezin e
Hingî dişome
Têra bejna min e
Bejna min spêndare
Spêndarê Romê ye
Çeqçeqa bîrê ye
Bîra lêv qeliştî
Zarokên çav şûştî
Jîr û nû gehiştî
Azad bin bi gişt

***Gelêrî***



# KELEŞÊRÊ HOLNENAS



Me heye yek keleşêr
Ew zîrek e nayê kêr
Li serî kumbirek sor
Ciwan e ew gelek zor
Dûvê wî zilfên rengîn
Xemla wî gelek şîrîn
Ew rê diçe rasterast
Gav diavêje hemû ast
Gelekî dilbimerd e
Nizane tomik çend e
Li axê dibîne çiq
Ew hema dike tiq tiq
Dide mirîşk ziyafet
Bi vê distîne rûmet
Di şer de jî zîrek e
Pêş xwe kesî nas nake
Kî biaxive li holê
Ew lê vedike tolê
Sibehê zû radibe
Bi roja nû şadibe
Berê xwe dide esman
Çav neqandî bêgûman
Ji dil dike qîqloqî
Şiyar dike tev xelqî
***Penaber***

## WATEYÊN PEYVAN

**Keleşêr:**Dîk, dîkil, şêrgele
**Zîrek:**Kêrhatî, jîr, jêhatî
**Tomik:** Xwarina lawirên binikil. Xwarina lawiran li ser xefikê têdanîn.

## EM TÊBIGIHIN

1- Dîtina keleşêr çawa ye?
2- Keleşêr ji mirîşkan re di nava reftarekî çawa de ye?
3- Keleşêr li holê çawa ye?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Her yek ji peyvên li jêr di nav hevokekê de bi kar bînin.
"*zîrek, mirîşk, keleşêr, hol, rûmet*"
2- Peyvên hevoka li jêr bi awayekî rast bûne kite yan na?
***Gelekî dilbimerd***
***e.Ge-le-kî dil-bi-mer-***
***de***.
Di her kiteyekê de we çend tîpên dengdêr dîtin?

## HÎNDARÎ

Helbestê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin. Piştre bi dengê bilind bixwînin. Yek ji we malika "*Sibehê zû radibe.*" ***"Bi roja nû şadibe"*** şîrove bikin.

# RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE

Rojekê li Efrînê vekirina dibistanekê hebû. Rêveberiya dibistanê û mêvanên vexwendî, xwendekar û malbatên xwe amade bûn. Ji ber ku dibistana xwe vedikirin, hemû di nav kêfxweşiyeke mezin de bûn. Yekem car bi zimanê dayikê wê dest bi perwerdê bikirina.

Dema ku mamostayekê ji bo axaftina vekirinê banî hevseroka meclîsa gel a Efrînê kir. Xwendekarekê gulek pêşkêşî wê kir. Lê wê gul negirt û got:

-Yên ku şayanê vê gulê ye, mamoste ne, ne ez im. Gulê bide mamostayên birûmet.

Rast e ji ber ku mamostetî karekî pîroz e, divê em li hember wan rêzdar bin.



## WATEYÊN PEYVAN

**Rêzdarî:**Hurmetdayîn
**Vexwendin:**Daxwazkirin, dawetkirin
**Şayan:**Hêja, layîq

## EM TÊBIGIHIN

1- Mamoste, xwendekar û malbatên xwe ji bo çi kom bibûn?
2- Kêfxweşiya wan kesên amade ji bo çi bû?
3- Mamoste ji bo axaftinê bang li kê kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Çima navên li jêr taybet in?
"Mihabad, Cizîr, Kobanê, Qamîşlo"
*Ew navên ku tenê ji bo heyînekê tên bikaranîn re**navêntaybet** tê gotin.*
2- Tîpa destpêka navên taybet mezin tê nivîsandin.

## HÎNDARÎ

1- Destpêkê, mijarê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin; piştre bê deng û bi deng bixwînin.

2- Dema hevalên we mijar xwendin, baş guhdarî bikin ka hevalên we mijarê rast dixwînin yan na?

3-Ramana bingehîn ya mijarê ji mamostayê xwe fêr bibin û li lênûsa xwe binivîsin.

# XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

## Tîpên Mezin
*A B C Ç D E Ê F G I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*

## Tîpên Biçûk
*a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z*

# PIŞÎLE

Pişe pişe pişîle
Çaw ciwan û zerdîle
Le naw mal û kolana
Li ser ban û dalana
Herdem mîlo moyetî
Bîrî zigî xoyetî
Destî kewê tozqalê
Goştî mirîşkî malê
Yan le goşe û kenarê
Bidizê cucik becarê
Yan biçête ser hewzan
Derbênê masî cuwan
Yan le kelên û qujbin
Birifênê mişkî xirpin
Ey pişîley mû belek
Dest helgire leklek



**Pisîka Wanê**

## WATEYÊN PEYVAN

**Zerdile:**Zerik
**Tozqal:**Piçikek
**Kelên:**Kun
**Qujbîn:**Goşe
**Birifêne:**Birevînî
**Xirpin:**Qelew
**Desthelgire:**Dest jê berde
**Kelek:**Hîle, fêlbazî

## EM TÊBIGIHIN

1- Pişîle her tim di hizira çi de ye?
2- Xwarina pişîlê piranî çi ye?
3- Sûdê pişîlê ji bo me çi ye?

## WATEYA HELBESTÊ BI KURMANCIYA JORÎN

Çaw cuwan û zerdîle
***Çavê wê spehî û zerîn e***

Birî zigî xoyebî
***Her tim di hizra zikê xwe de ye***

Destî kewê tozqalê goştî mirişkî malê
***Eger piçek goştê mirişka malê bigihê destê wê***

Yan le kelên û qujbin bifirinê mişkî xirpin
***Yan jî li kun û derzên dîwaran mişkên qelew birevîne***

# PAQIJIYA DERDORÊ

Dostekî min got:

-Em bi malbatek nas re bi keştiyê çûn geştê. Dostê min ji berîka xwe pakêtek çoklat derdixe, kaxeza wê jê dike. Piştî çoklatê dide zarok, kaxeza wê jî digelifîne û davêje Gola Wanê. Zarok dide ber qîran:

-Aa! Hûn ê Gola Wanê qirêj bikin! Temaşe bikin li pêşberî we gelaşdank heye. Çima hûn davêjin Golê?

Ez rojekê bi hevalekî xwe re li Xelatê daketim Golê. Dema em bi kêştiyê di nav golê de digeriyan derdor bi qirêjiyê tijî bû. Peravên golê ji qirêjiyê nedihat dîtin. Min bang li berpirsyar kir: -Çima hûn van deran paqij nakin?

Min ev bersiv girt:

-Camêr, em van deran her tim paqij dikin lê bênavber hin vî gelaşî davêjin golê. Ya zor ew e, em derfet bibînin ku xwe ji gemarê rizgar bikin.

Ji bo gol paqij bimîne tê xwestin ku em ji her goşeyeke welatê xwe wek mala xwe hes bikin. Di rastiyê de divê welat malek hîn firehtir bê dîtin. Wê demê welat wê maleke paqij û malbateke bi rêkûpêk be.



## WATEYÊN PEYVAN

**Xelat:** Navçeyeke girêdayî bajarê Bidlîsê ye.
**Gelaşdank:**Cihê gelaş, qotiya gemarê
**Gelifîn:**Qurmiçandin

## EM TÊBIGIHIN

1-Zarok çima qîriya?
2-Zarok xwest ew mirov çi bike?
3-Çima Gola Wanê paqij nedima?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Em rastnivîsa peyvê, di nivîsandina mijarê de fêr bibin.

1-Ji peyvên ku li jêr ne wekhev hatine nivisandin kîjan rast e? Hûn dikarin ji mijarê sûd bigirin.

**Xelat-Xalat**
**Welat-Walet**

2-Peyvên li jêr ji ber ku her yek ji wan giştiyekê diyar dikin jê re navên giştî tê gotin.

**Mînak:** Peyva golê, gelek golan tîne bira mirov.

**gol**
**gelaş**
**zarok**
**keştî**

## HÎNDARÎ

1- Ji bo ku hûn bi dengekî xwezayî bixwînin, li cihê bêhnok, xal û nîşana pirsê li gor pêdiviyê rawestin.

2- *“**Egerher kes derê mala xwe paqij bigire, tevayî welatê mewê paqij bimîne.**”*

Vê gotina li jor vekin. Girêdana vê ya bi mijarê ve bidin diyarkirin.

3- Çima pêwîst e ku em derdorê xwe paqij bigirin? Di refê de şîrove bikin.

# PERPEROK

*Perperoka evîndar*
*Xalên perên te jîndar*
*Li ser gulan digerî*
*Bi te dibim hêvîdar*

*Tû kes nebêjin kulî*
*Evê lingê wî stirî*
*Ev guleke difire*
*Xemla derdora min î*

***Penaber***



***Mijara bi navê perperok bi tîpên mezin û biçûk bi xemil li lênûsa xwe binivîsin.***






# TEST 2

**1- Ew navên ku tenê ji bo heyînekê tên bikaranîn re çi tê gotin?**

a) Navên taybet
b) Navên giştî
c) Navên koman

**2-Kîjan navên li jêr navê giştî ye?**

a) Efrîn b) Kurdistan c) çiya

**3- Di kîjan hevokên li jêr de navê taybet heye?**

a) Bizin diçêrin.
b) Firoke difirin.
c) Kerkûk bajarekî dîrokî ye.

**4-Ji peyvên li jêr kîjan ji yekê zêdetir heyînan dide diyarkirin?**

a) Egîd b) zarokan c) bihar

**5-Ji rêze peyvên li jêr kîjan nabe hevok?**

a) Rojekê heval hatin.
b) Me nan û penîr xwarin.
c) Sibe hûn.

**6-"Wateya berxwedan û kedê çi ye?" Di peyva destpêka vê hevokê de çend tîpên dengdêr hene?**

a) dû b) çar c) sê

**7- Rûmetên gelan çi ne?**

a) Şehîd û gazî
b) Telefon û televîzyon
c) Welatparêzî û xemsarî

# BEŞA 3

## GURÊ ÇAVBIRÇÎ

Di demeke kevin de, gurekî rûviyek girt û gotê:

- Zû ji min re hinek xwarin bibîne, yan ez ê te bixwim.

Li nêzîkî wan, mala cotkarekî hebû. Conegayek ser jê kirîbû û goştê wî di nav banîje (çatî) de veşartibû. Rûvî ev ji gur re diyar kir û got:

- Ger tû bixwazî, em dikarin bi hev re biçin bixwin. Gur:

- Bila, hem di çûyîna malê de, hem jî piştî me goşt xwar, di revînê de tû yê alîkariya min bikî.

Herdu bi hev re çûn mala cotkar. Bêdeng ketin nav banîjê (çatiyê). Zêdebûna goşt pir kêfa gur anîbû. Ji kêfan nedizanî çi bike. Rûvî ji aliyekî ve goşt dixwe, ji aliyê din ve jî dibeze ber kulekê. Ji bo hêsan bikare tê re bireve, dipîve.

Gur jê pirsî:

- Çima tû bi dilê xwe naxwî?

Rûvî:

- Ez lê dinêrim ka kes tê yan na? Ez ji bo te jî pêşniyar dikim, zêde nexwe.



Gelek neçû, cotkar qirçqirçên di banijê de bihîst û bezî. Dema rovî dengê lingê cotkar bihîst,
di kuleka hatî re zû derket û çû. Gur jî xwest li pey wî biçe, lê ji ber ku ewqas goşt xwaribû zikê wî werimîbû û di kulekê de asê ma.

## WATEYÊN PEYVAN

**Çavbirçî:** Yê têr nexwarî.
**Kulek:**Di odeyan de pencereyek biçûk.
Banîje: çatî

## EM TÊBIGIHIN

1- Gur û Rovî ji bo zikê xwe têr bikin çûbûn kûderê?
2- 2- Bi rêzê ve çi bi serê gur û rovî hat?

3- Gur û roviyê ku di vê çîrokê de cih digirin, taybetiyên wan çi ne?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Hevoka li jêr li lênûsa xwe bi nivîsin.
*"Li nêzîkî wan, mala cotkarekî hebû."*
Di vê hevokê de peyva cotkar li peyva **"cot"** paşgira **"kar"** hatiye zêdekirin.
Têkiliya di navbera peyvên **"cot"** û **"cotkar"** de çi ye? Di refê de şîrove bikin.
2-***"Çima tû bi dilê xwe naxwî?"*** Çi hêma li dawiya vê hevokê hatiye danîn?
Li dawiya hevokên pirsyarî hêmaya pirsê (pirsnîşan) **(?)** tê danîn.

# HÎNDARÎ

1- Dema hûn mijarê dixwînin, peyvên hûn wateya wan nizanin diyar bikin. Ji bo têgihiştina wan peyvan, arikarî ji hevoka tê de derbas dibe bigirin. Peyva we wateya wê nezanî, ji ferhenga Kurdî sûd bigirin û têbigihên.

2- Bêyî ku rêza bûyeran xira bikin çîrokê bibêjin. Piştre, bi
çend hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Dema hûn kurtiya çîrokê dinivîsin, destûrên nivîsînê, di cih de bi kar bînin.

2- Ramana bingehîn ya we nivîsandî nîşanî mamosteyê xwe bikin.

***“Mirov dikare zikbirçiyan têr bike lê mirov nikare çavbirçiyan têr bike”***

***“Gotina pêşiyan***”

# PIRTÛK



Dostek min a pir delal
Heye bêdest, pê û pal
Weke kesê ker û lal
Bêdeng rûdine li mal
Ne hewar û şer û qîr
Ne şivan e ne jî mîr
Ne xwarin dixwe ne cil
Tev pesnê wê ye ji dil
Lê ne ker e û gewc e
Her kes pê dibe hewce
Xwedî zimanekî şîrîn
Zana, zîrek û hiş în
Dema vala bûm ji kar
Diçim dîwana rêzdar
Bersiveke rast û dilnerm
Pêşkêş dike bi dilgerm
Heke we got ew çi ye?
Ew dostê zana kî ye?
Na ji we re nabêjim
Ma qey ez şaş û gêj im
Bipirsin ji bihîstok
Heke we dîte pirtûk

## WATEYÊN PEYVAN

**Gewc:**Gêj, aqil sivik
**Bal:** Hişyarî
**Pesin:** Navtêdan, zirit

## EM TÊBIGIHIN

1- Di malika şeşê de kîjan pesin tên dayîn? Şîrove bikin.
2- Nivîskar di dema xwe ya vala de çi dike?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di helbestê de peyvên wekî ***“pirtûk, dîwan, dost***” derbas dibin. Pêveka pirjimariyê li van peyvan zêde bikin û bikin pirjimar.

Peyvên li jêr lêkolîn bikin.

Bersiv bersivan
Şivan ⟶ şivanên
Mal ⟶ malan
Zana ⟶ zanayên

## HÎNDARÎ

1- Li ser helbestê bixebitin, heya hûn jî weke mamoste xweş bixwînin. Piştre helbestê bi awayekî bi wate û dengekî bilind bixwînin.
2- Ji bo pîrozkirina Roja Mamosteyan, ji mamosteyên xwe re nameyeke pîrozbahiyê binivîsin.


# ÛLAMVAN Û KEÇIKA BIÇÛK

Ûlamvan: Êdî ez pîr bûme. Lê ez hêji vê name birinê hes dikim. Dema ez ji ûlamxanê derdikevim ez dikevim nava kolanan…

Laleş :"Mam ûlamvan, name ji me re jî heye?Kanê we soz dabû me. Nameya min li ku derê ye"?

Ûlamvan: "Ev henekên te, min pir kêfxweş dikin. Zarok, hevalên min yênherî baş in..."

Di qesra li pêşberî beravê de min keçikek pir xweşik dît. Ev keçik berê ne li wir bû. Wê keçikê tenê, banî min nekir. Lê ez nizanim çima?



Rojekê, ez hatim ber deriyê qesrê. Keçek kirasek dirêj, li ber rawetayîbû û temaşeyî leyîstina zarokan dikir.

Min gazî wê kir:

-Tû nû hatî vê derê? Navê te çi ye?

- Navê min Delale.

Min gotê:" çima tû li wêderê rawestiyayî?"

- Dê tû jî here û bileyîze.

Di wê demê de pîre mêrek ji malê derket, qêrek da keçikê.

- Min çend caran gotiye te li vê derê raneweste. Dê zû here malê.

Delal li ser lingekî xwe dihilavêt û debasî wî aliyê baxçe bû. Keyfa min hat. Min got: Delal li pêşberî bavê xwe yê bêzar jî dikare bileyîze.

Lê vê keyfxweşiya min pir berdewam nekir, ji ber kû min dît, ev keçika ciwan bi lingekiye. Ez bi vê rewşê pir xemgînbûm.

## WATEYÊN PEYVAN

**Ûlamvan:** Kesê nameyan belav dike.
**Ûlamxane:**Cihê ragihandina pergalên wekî name, telgraf û hwd.
**Qesir:** Xaniyên bi huner û mezin

## EM TÊBIGIHIN

1- Lehengê vê bîranînê kîne?
2- Ûlamvan ji kîjan rewşa Delalê têneghîşt?
3- Ûlamvan û Delalê çawa hev naskirin?
4- Ûlamvan piştre li kîjan rewşa Delalê rast hat?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Navê mirov û paşnavên wan taybetinbi tîpa mezin destpêdikin.

Navên taybet yên di mijarê de li lênûsa xwe binivîsin.

2- Di hevokên jêr de kîjan peyv hevokê dike hevoka pirsyarî?

Dema ez ji ûlamxanê derdikevim, ez çima dikevim nava kolanan?

Ma wê bê mala me jî?

# HÎNDARÎ

1- Hûn çawa nêzîkî hevalên seqet dibin?

2- Di sersal, cejn û rojên taybet de em ji hevalên xwe re qertên pîrozbahiyê rê dikin?

Dema em qertên pîrozbahiyê dinivîsîn, em bal dikişînin li ser van xalan.

-Di destpêka nivîsînê de peyvên wekî, “birêz, hêja, bi rûmet” yan jî “xweştivî” tê nivîsîn.

-Em qertên xwe yên pîrozbahiyê bi hevokên kin dinivîsin.

-Li binê nivîsa xwe li milê rastê em wajo dikin û navê xwe dinivîsîn.

-Nivîsîna xwe em bi şêweyekî xweş û bi pênûseke xweşik dinivîsîn.

Li jêr mînaka nivîsîna pîroz kartekê heye.

***Xaleta min ya bi rûmet;***

Ez sersala te pîroz dikim, rojên xweş û bextewar ji te re dixwazim. Destên te radimûsim.

***Dara Çiyayî***

***wajo***

# YEKITIYA ÇÛKAN

Hebû dehleke şahî
Bi dar û av û kanî

Darên wê dehlê biber
Tîrêjên tavê li ser

Fêkî digirtin daran
Pîvan nebû bi baran

Li nava dehla xweşik
Her cûre çûkên nexşik

Li nav dehlê digerîn
Tim bi refan difirîn

**Egîd Dijwar**



# PENDÊN PÊŞIYAN

***Gotinên li jêr bixwînin.***

Pergala şikestî çêtir e ji ya xwestî.

Dewê ceribnadî çêtire ji mastê ne ceribandî.

Ne li geliyê kûr radizim, ne xewnên xirab dibînim.

Hêvî nîvê serkeftinê ye.

Destê tenê deng jê nayê.



# NAME JI BO DAPÎRÊ

Dapîra min a hêja;

Ez dizanim ku ji bo nivîsandina nameyê dereng mam. Min îro jimart. Ev sê meh in em ji hev dûr ketine. Min bibexşînin.

Em hemû li vê derê baş in. Waneyên min jî baş diborin. Birayê min jî fêrî xwendin û nivîsandinê dibe. Ji bo vê bi şev û roj dixebite.

Xweşiyên bêhndana ku min li gel we derbas kirî, ji bîr nakim. Dehla ku me bi hev re av dida, fêkiyên me ji çiqên wan kom dikirin, hê jî li pêş çavên min in.

Dema Çavreş ji koxa xwe dûr dimîne dike orîn?

Xweşiya nivîşk û toya ku we çêdikir, ti car ji devê min naçe. Caniya me ya Reşbelek, careke din, teriya xwe radike û dibeze?

Dapîra min; ez li benda dîtina we me. Ji bo hatina li gel we bê hedar im. Min gelek bêriya we, bapîrê xwe û gund kiriye.

Ez, ji dayik, bav û birayên xwe re silavên xwe bidil û can dişînim. Ji bo we rojên bi tendurist dixwazim.

Silav û heskirin.

***Dilar HESRET***

*(wajo)*

Navnîşan:
Şemzînan14-02-2002





## WATEYÊN PEYVAN

**Canî:**Mehîna biçûk
**Bexşandin:**Lêborîn
**Wajo:**Îmze, şanenav, destnîşan

## EM TÊBIGIHIN

1-Dilar, ji bo kê name nivîsiye?
2-Dilar, rojên li gund borandî çi ji bîr nekirine?
3-Dîrok û navnîşan, li ku dera nameyê hatiye nivîsandin? Wajo li ku derê hatiye avêtin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1-Navê çêlek û caniya di nameya Dilarê de derbas dibe çi cureyên navan e? Tîpên destpêka van navan, di nav hevokê de bi tîpên mezin hatine nivîsandin.

Wek di nameyê de tê dîtin, navên taybet li lawiran jî tê kirin. Ji wan navên taybet yên ji lawiran re hatî dayîn, yên hûn dizanin yan jî yên hûn fêr bûne, li lênûsa xwe binivîsin.


2- Peyvên li jêr her yekê di nava hevokekî de bi kar bînin.
*"nivîşk, dapîr, bapîr"*

# HÎNDARÎ

1-Ji xizmeke xwe re nameyekê binivîsin.
Dema hûn nameyê dinivîsin van xalan ji bîr nekin.
Dîroka rojê, wajo û navnîşana xwe li cihê wan binivîsin.
Nameya xwe li ser peleke bêxêzik û bi pênûsa diwêd (hebir) binivîsin.
Nivîsandina tiştên hûn dixwazin vekin, pirs bikin û ji bîr nekin. Nameya xwe bi silav û hêviyên baş, bi dawî bikin.

2-Li ser zerfa li jêr, kîjan zanîn cih digirin, lêkolîn bikin û bibêjin.

3-Nameya xwe wekî mînakê binivîsin, bixin zerfê û rê bikin. Tiştên hûn di wêneyên jêr de dibînin bi rêzê ve vekin.



# *XWENDEKAR*

***Xxwendekarek birêz çakim,***
***Ne başiyan ti car nakim.***
***Hêza gelê xwe peydakim,***
***Ne azadbim qebul nakim.***

***Xwendekarek şox û şengim,***
***Ne bê rêzim, pir bê dengim.***
***Di dil de ez pir çelengim,***
***Di cih de be, ne bê dengim.***

***Li cem min pîrozî hene,***
***Dê û bav û xwîşkên me ne.***
***Li rex wan hin dî jî hene,***
***Mamoste û birên me ne.***

***Li gel her kesî em başin,***
***Em dixwînîn qet ne şaşîn.***
***Her roj hinekî li pêşin,***
***Ti caran em ne li paşin.***

***M. M. Şirîn Çetîn***

## WATEYÊN PEYVAN

**Birêz:** Rêzdar
**Çakim:** başim
**Çelengim:** jêhatîme.
**Şengim:** xweşîkim
**Şox:** xweşik, bedew.

## EM TÊBIGIHIN

1- Xwendekar mirovên çawanin?
2- Dema dibêjin xwendekar kesek çawa tê bîra we?
3- Çar teybetmendiyên xwendekar di vê helbestê de diyar bikin?

# BEFIRBARÎ

Befir barî, befir barî!
Rû spî kir şeva tarî
Zarokno da bikin karî
Talgê çêbikin li vî warî
Em çêbikin peykerekê
Her wekî pîrekalekê
Li rêwiya kir silavekê
Her spêdê û êvarekê
Çi bûye li van deveran?
Bi ku ve çûn tebên va deran?
Xak spî ye weke gewheran
Şîn dike şînya biharan

***Gelêrî***



## WATEYÊN PEYVAN

**Peyker:**Put, heykel
**Talge:**Golat, guloka berfê

## EM TÊBIGIHIN

1- Di barîna berfê de çi guhertin çêbû?
2- Zarok, di berfê de ji çi lîstokê re tên gazîkirin?
3- Hûn ji gotina "*Em çêbikin peykerekê*" çi fêr dibin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Li dawiya rêzikên li jêr yên ji helbestê hatî girtin kîjan hêma hatine bikaranîn?

Van hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

**Befir barî, befir barî!**
***We li dawiya vê hevokê baneşan (!) danî?***
***Çi bûye li van deveran?***
***We li dawiya vê hevokê nîşana pirsê (?) danî?***

2- Peyva di hevoka jêr de tarî hatî nivîsandin. Bi kîjan pêvekê hatiye herikandin?

Em çêbikin peyker**<u>ekî</u>**.

Em dibînin ku ev peyv, ji peyva ***"peyker"*** bi pêveka ***"ekî"*** hatiye herikandin.

# HÎNDARÎ

**1-Bersiva pirsên li jêr bidin.**

- Sûdên hewaya vekirî û werzîşê çi ne?
- Li gorî demsalan lixwekirina cilan çima pêwîst e?

**2-Dema mamosteyê we helbestê dixwîne li van xalan şiyar bin.**

- Li dawiya rêzikê li kîjan hêmanê çiqas radiweste!
- Her rêzikekê bi pivana dengekî çawa dixwîne?
- Hevalê we yê herî xweş helbestê dixwîne mînak bigirin.

# VIZ VIZ XATÛN

Viz viz Xatûna reş û zer, ji kulîlkê çû kulîlkê. Tûrê xwe bi şêlika gulan dagirt û vegeriya mala xwe.

Di selamêşê de, gelek mêşên hingiv hebûn. Kurmêşên hingiv gelek tiral û zexim bûn. Tim dihatin rex hev û radizan.

Viz viz Xatûnê şêlika ku anî, xist nav şana di kewara mêşan de. Di gelek şanan de kurmikên mêşan hebûn.

Di kewarê de jî Keybanûyek hebû. Keybanû ji mêşên din hîn mezintir û ciwantir bû.

Erkê keybanû, her roj çend hêkan di şanan de bike. Kurmikên ji hêkan derdikevin jî dema mezin dibin weke Viz viz Xatûnê dibin mêşên karker. Şêlika gulan kom dikin; li kurmikan dinêrin; selemêşê paqij dikin.

Mêşên ku bi meyzandina kurmikan karmend in, rojekê gotin, Keybanûyek digihê. Dema Keybanûyê ev bihîst, gelek bêzar bû. Bi mêşên li derdora xwe kom bûyîn re ji selemêşê qetiyan. Li ser çiqê darekî danîn.

Keybanûyê mêş xistin hundirê kewareke nû. Mêşên hingiv bi hemû hêza xwe xebitîn û mala xwe ya nû bi şanan xemilandin. Şan, ji bo zivistanê bi hingiv dagirtin.



## WATEYÊN PEYVAN

**Erk:**Peywir
**Tiral:**Bêkêr
**Şan:**kunikên mêşên hingiv
**Kewar:** Selemêş, gurbe
**Şêlik:**Toza gul û kulîlkên ku hingiv jê çêdibin.

## EM TÊBIGIHIN

1- Viz viz Xatûn û hevalên xwe, li hundir û derve çi dikin?
2- 2- Karê keybanûyê çi ye?
3- Keybanû, ji ber çi bi komekî ya mêşan re ji selemêşê derdikeve?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Paşgira peyva karker jê hatiye veqetandin. Hûn jî ya din veqetînin.

**Kar - ker mêşvan**

2- Di mijarê de tîpên destpêkê yên hevokan çawa hatine nivîsandin? Li dawiya hevokan kîjan hêmayên nivîsînê hatine bikaranîn? We dît ku tîpa destpêkê ya hevokan mezin e û li dawiya hevokan **xal (.)** hatine bikaranîn.

3- Hevoka li jêr a di mijarê de derbas dibe, lê wek hûn jî dibînin peyvên wê têkel hatine nivîsîn. Cihê van peyvan rast bikin û hevokê saz bikin.

**jî Keybanûyek de hebû kewarê di**

# HÎNDARÎ

1- Li jêr, destpêka çîrokekî hatiye nivîsandin. Vê çîrokê li gorî daxwaza xwe temam bikin û di refê de ji hevalên xwe re bixwînin.

**Hebû tûnebû xalxalokek hebû...**

2- Nivîsandinê bêdeng bixwînin. Ji bo zêdekirina leza xwendinê bixebitin.

3- Li hevalên xwe yên ku mijarê bi dengekî bilind dixwînin baldar bin:

-Dengê wî xweş tê bihîstin?

-Bi dengekî xwezayî û bi wate dixwîne?

4- Hûn ji bo pirtûkxwendinê hewl didin?

# ZERDELÎ

Min heye darek zerdelî
Mezin dikim bi delalî
Li destpêka germebayê
Bi kulîlkan dixemilî
Darê zû kulîlk vekirin
Belkên xwe şîn û geş kirin
Li hemberî vê sermayê
Gelekî wêrekî kirin
Ditirsim ku bayek were
Bi darê re bike şere
Dara min xwe li ber negre
Kulîlkên wê tev bi were
Lewra min gotê, dara min
Xemla li ber dergehê min
Bi lez û bez xwe geş neke
Vê keda xwe winda neke

***Penaber***



## WATEYÊN PEYVAN

**Wêrek:** Cesaret, zîrek
**Zerdelî:** Dara mijmij.
**Dergeh:** Cihê derketinê

## EM TÊBIGIHIN

1- Dara zerdelî di kîjan demsalê de kulîlkan vedike?
2- Hozanvan, ziyana zû kulîlk vekirina zerdeliyê çawa aniye ziman?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Tîpên destpêka rêzikan çawa hatine nivîsandin?
2- Peyva li jêr tarî hatî nivîsandin ji hevokê derxînin. Di hevokê de kêmasiyek ya wateyê çêdibe?
Min heye darek zerdelî / mezin dikim bi **delalî**

## HÎNDARÎ

1- Cihê hûn lê dijîn kîjan dar tên dîtin? Nave wan daran, binivîsin..
2- Kîjan aliyên biharê bi we xweş e? Binivîsin

# HEŞTÊ ADARÊ

***Hêlîn*:**Îro 8"ê Adarê ye û rojeke pîroz e. Em jî bi vê rojêgelek dilşad in.

***Sîdar*:**Ji bo çi rojek pîroz e?

***Hêlîn*:**Di 8"ê Adara 1871"an de, di kargeha Kotal de, li bajarê Newyorka Emerîkayê jinên karker ji bo mafên xwe serî hildan. Karbidest û dewlet bi hev re bi ser wan de çûn. Di wê êrîşê de gelek jinên karker jiyana xwe ji dest dan.

8"ê Adarê sala 1910"an û pê ve weke „Roja Jinên Kedkar yên Cîhanê" hatiye pejirandin û tê pîrozkirin.

***Sîdar*:**Gelo ji bo me çi wateyên wê yên taybet hene?

***Hêlîn*:**Belê, Heval Sîdar! Têkoşîna me, ya ku bi pêşengtiya Rêber APO dest pê kirî, didome. Aliyekî wê yê girîng berdewamiya têkoşîna jinê ye.

***Sîdar*:**Çawa?

***Hêlîn*:*"Azadiya jinê, azadiya civakê ye*."

***Sîdar*:**Jin di jiyanê de ewqas girîng e?

***Hêlîn*:**Ma te nebihîstiye? "***Jin jiyan e."Jin dayîk, eşq ûevîn,hezkirin û hembêzkirin, delalî û zelalî, dilnizmî û dilxweşî*** ye.



## WATEYÊN PEYVAN

**Dilşad:**Dilxweş, kêfxweş
**Kargeh:** Cihên ku tişt lê tên çêkirin.
**Karbidest:** Kesên kar û pergalên hilberînê di dest de.
**Çavkanî:**Jêder

## EM TÊBIGIHIN

1- Hêlîn ji hevala xwe re çi rave dike?
2- Ji kengê ve 8'ê Adarê tê pîrozkirin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Peyvên li jêr ku di nivîsandinê de derbas dibin, ji bo çi navên yekjimar in.

***jin, karker, têkoşer***

Navên li jêr pirjimar in. Pirjimarî di nav hevokê de pêk tê.

Mînak:

Jin**ên** Kurd.
Maf**ên** jin**an**.
Karker**ên** welatparêz.

Ji ber ku pêveka pirjimariyê "**ên**" girtine bûne pirjimar.

Van navên li jêr yên yekjimar bikin pirjimar.

*"karbidest, cejn,sal"*


## HÎNDARÎ

1- Mijarê bê deng û bi lez bixwînin.
2- Mijarê di refê de bi deng û rast bixwînin.
3- Dema hevaleke we bi deng dixwîne, bi baldarî guhdarî bikin û bi tiştekê ve xerîk nebin. Di cihê xwe de bi asayî û rast rûnin.

# AZADIYAÇANDÛ ZIMAN

Ziman, têgeh û kevirên bingehîn ên bîr û pêşketina hişmendiya civakê ne. Heta mirov nebe xwediyê van keviran, mirov nikare ti çalakiyeke civakî li darbixe. Ev rêgezên bingehîn ên hebûna xweparastin û pêşvebirina hemû netewan e.
Wekî netewe û gelê Kurd, em jî xwedî zimanekî herî kevnar yê Mezopotamyayê ne. Zimanê ku pê jiyan hatî avakirin, civakbûyîn pê çêbûye. Zimanê pêşvebirin û zanyariya civakbûyîn û xwezayiyê ye. Dîroka zimanê Kurdî, dîroka jiyanafirandin, civakbûyîn, çand û exlaqê civaka polîtîk û rêgeza jiyana hevpar in. Ji xwe tiştên ku mirov kirin mirov jî ev hîmên bingehîn in.

***Rêber APO***



# TEST 3

**1 - Wateya peyva "ûlemavan"ê çiye?**
a) Kesê nameyan belav dike
b) Kesên nameyan dinivîse
c) Kesên nameyan dixwîne

**2 - Kîjan navê li jêr taybet e?**
a) Pênûs
b) Dibistan
c) Aram

**3 - Helbesta binavê "XWENDEKAR"** li ser çi **hatiye nivîsîn**
**a)**Li ser leyîstokan
b)Li ser karkirinê
c)Li ser xwendekaran

**4 - Kîjan hevoka li jêr rast hatiye nivîsîn?**
a) Kurdistan welatê Kurda ye.
b) Çû mal ew.
c) Xwe nekir amade ji şer re

**5 - Roja Jinan kengê ye?**
a) 21'ê Adarê
b) 8'ê Adarê
c) 1'ê Gulanê

# BEŞA 4

## DIRAVÊN AMADE

Qerdarê Melayê Navdar tê, qerê xwe ji Mela dixwaze. Mele:

-Bi Yezdan, niha diravên min nîn in; lê ez ê di demeke nêzîk de bidim te.

Zilam xwe vedikişîne:

-Tû yê kengî û çawa bidî min? Mela:

- Li pêş mala min deviyên stirî hene, di demsala biharê de wê şîn bibin.

- Êêê!...

- Dema pez di nav deviyan re derbas bibe, hirîya pez wê stiriyan ve bimîne.

- Erê!..

- Wê xatûna min, wê hiriyê kom bike, birêse û bike rîs.

Ez ê wan bibim bazarê bifiroşim û diravên te bidim te.

Dema zilam, bi dengekî bilind dest bi ken kir...

Mela:

- Hey gidî, dema diravên amade dibîne, çawa dikene.



## WATEYÊN PEYVAN

**Ristin:** Ji hiriya mih û mûyên bizinan çêkirina ben.
**Qerdar:** Deyndar, kerdar
**Dirav:**Pere

## EM TÊBIGIHIN

1- Zilam, ji Melayê Navdar çi xwest?
2- Melayê Navdar, rêyeke çawa ji qerdarê xwe re pêşniyar kiriye? 3- Qerdar, çima bi vê pêşniyarê kenî?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di çîrokê de, li dawiya peyva li jêr hêmaya baneşanê hatiye bikaranîn.

Vê peyvê li lênûsa xwe binivîsin.

**- Êêê!...**

## HÎNDARÎ

1- Bêyî li pirtûkê binêrin, pêkenoka li jor, dû bi dû zîndî bikin.
2- Lîstoka hûn dilîzin, bi liv û tevgeran dewlemend bikin.
3- Fêrî pêkenokek ya Melayê Navdar bibin. Vê çîrokê, bi hevokên xwe binivîsin..

.

## ZAROK Û LÎSTOK

Yên mezin gelek caran di aliyê lîstinê de xwediyê têgeheke cuda ne. Dibêjin; hûn ê cil û bergên xwe bikin herî û gemar. Bi vê helwestê ji lîstinê re astengiyan derdixin, lê lîstin ji bo tendirustiya zarokan baş e.

Belê; dema ez di dibistana seretayî de bûm, ez rojekê di navbera dû waneyan de, ji refê derneketibûm. Ez li cihê xwe rûniştibûm, min pirtûkek dixwend. Li derve jî baraneke hûr dibariya. Hemû hevalên min ji xwe re dilîstin. Mamosteyeke me ji der ve hat. Bi destê min girt û ez derxistim derve, got:

-Pêwîst e zarok, zarokatiya xwe bijî. Dema xwendinê xwendin, dema lîstinê lîstine.

Ev çend sal in, min ev gotin ji bîr nekiriye. Piştî ez mezin bûm, rastiya vê gotinê tê gihîştim. Dostanî, hevaltî û hevkarî bi lîstokan tên destpêkirin. Bi vê boneyê her roj di baxçê dibistanê de, min bi hevalên xwe re gog û lîstokên din dilîst.



## WATEYÊN PEYVAN

**Cil û berg:** Libas, kinc
**Gemar:**Qirêj
**Tendirûstî:** Saxlemî
**Helwest:**Li beramberî tişekê reftar nîşakirin.
**Bone:**Mebest, sedem

## EM TÊBIGIHIN

1- Li gorî têgihandina nivîsînê, yên mezin ji ber çi astengiyan derdixin, hûn tevlî dîtina wan dibin?
2- Lîstin çima ji bo zarokan pêwîst e?
3- Xwendekar kîjan gotina mamoste ji bîr nekiribû?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**1-** Hevokên li jêr, li lênûsa xwe binivîsin.
*Hemû hevalên min ji xwe re dilîstin. Bi destê min girt û ez derxistim derve.*
Di nav hevokan de peyvên kar (kiryarê) didin diyarkirin kîjan in? Binê wan xêz bikin.
Peyvên kar didin diyarkirin "dilîzin" û "derxistim" we dîtin?
*Di hevokê de ji peyvên kirinekê didin diyarkirin re* ***kar*** *tê gotin*.

## HÎNDARÎ

1- Di nivîsa we xwendî de, ji bilî tiştên hatine têgihandin, lîstin, kîjan sûdan dide mirovan? Bi hevalê xwe re şîrove bikin.
2- Dema hûn bi hev re dilîzin, pêwîst e hûn çi tiştan li ber çavan bigirin? Van destûran di refê de bi hev re diyar bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Destnivîsa xwar, tîpên biçûk û mezin li jêr çawa hatine nivîsîn, lêkolîn bikin. Wan rast û bi şêweyeke xweşik li lênûsa xwe binivîsin.

***Tîpên Biçûk***

*a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z*

***Tîpên Mezin***

*A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*

## NALÎNA KURDISTANÊ



Di gundekî Kurdistanê de lawikekî pir jîr hebû.Ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan bi şev û roj dixebitî. Kesên zana digotin: "Ev lawik wekî firîşteyan e".

Şevekê lawik di xewna xwe de difire. Paşê di mêrgeke têr sosin û beybûn de, li ser kaniyeke xweş rûdine. Temaşeyê ciwanên Kurdistanê dike. Di wê demê de dengê nalînekê dibihîze.

Dipirse:

- Ew kî ye dinale? Kurdistan:
- Ez im dinalim!

Lawikê hêja matmayî dimîne û dibêje:

- Çawa dibe? Tu xwediyê her tiştî yî, çima ewqas xemgîn î?

Kurdistan:



- Lawikê hêja! Ev bi sedên salan e, hûn li ser min dijîn. We, ez di bin lingên biyaniyan de hiştim. Ji bo bextewariya we, min her tiştên xwe pêşkêşî we kirin, ka we çi da min? We ba û ava min gemarî kir, axa min bê berhem kir. Min bi ba, baran û kulîlkên xwe yên rengereng dixwest dengê xwe bigihînim we lê hûn tênegihîştin.



Eger we ez parastibûma, min dikarî zêdetir jî bidaya we. Ma hêj ez dikarim çiqas xwe bigirim? Nizanim.

Lawik di nav xwêdaneke germ de, ji xewê şiyar bû. Bi rastî jî ji ber ku her kes ji bo xwe dihizire, her kesî welatê xwe ji bîr kiriye.

Ji bo Kurdistan ji bin destên biyaniyan azad bibe û bigihîje xwediyê xwe, lawikê hêja hemû heyîn û jiyana xwe pêşkêşî ciwanan û civakê kirin. Bi zanebûna xwe her kes kişand ser rêya şoreşgerî û welatparêziyê.



## WATEYÊN PEYVAN

**Lawik:**Xort
**Firişte:**Milyaket
**Sosin ûBeybûn:** Du kulilkên bêhnxweş.
**Temaşe:**Lênêrîn
**Matmayî:**Şaşmayîn, behitîn
**Bextewar:** Xwedîbext. Jiyana bi kêfxweşî û dilşadî.
**Berhem:** Ji karekî encama kedekê girtin, destkeft.
**Biyanî:** Kesê nenas.
**Şoreşger:**Têkoşer, vejînkar

## EM TÊBIGIHIN

1- Lawikê hêja mirovekî çawa bû?
2- Lawikê hêja di xewna xwe de çi dîtibû?
3- Kurdistanê ji lawikê hêja re çi gotibû?
4- Tiştên ku lawikê hêja jê re serkêşî kiriye çi ne?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di hevoka jêr de, peyvên ku çawaniya lawik didin diyarkirin, bibînin.

"Di gundekî Kurdistanê de lawikekî pir jîr hebû." Weke hûn dibînin di hevokê de peyvên "*pir û jîr*", çawaniya lawik dide diyarkirin.

*Ji peyvên ku rewşa navekî diyar dikin re* ***hevalnav*** *tê gotin.*

## XWENDEKAREKÎ JÎR

Ez xwendekarekî jîr im.
Zana û bi hiş û bîr im

Hez dikim ji dibistanê.
Bo xizmeta Kurdistanê.

Dixwînim bi zimanê xwe.
Da ez nas bikim gelê xwe.

Armanc ne şer e aştî ye.
Ji bo welat azadî ye.



Çek û pênûs hevalbend in. Ew bi hev re dewlemend in.



## WATEYÊN PEYVAN

**Bi hiş û bîr:**Zana, bihiş
**Jîr:**Jêhatî
**Hevalbend:** Kesên hevaltiya hev dikin.

## EM TÊBIGIHIN

1- Xwendekar xwe çawa dide naskirin?
2- Çima xwendekar ji dibistanê hez dike?
3- Armanca xwendekar ji zanabûnê çi ye?
4- Ji bo azadiyê çi tê xwestin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Azadî çi ye? Hîn bibin û di hevokê de bi kar bînin. 2- Peyva "*pênûs*"ê di hevokekê de bi kar bînin.

## HÎNDARÎ

1- Ji bo hûn fêrî navnîşanê cihê ku hûn diçinê bibin, divê hûn pirsên çawa bikin?

Bi vê armancê pirsên wiha pêk bînin:

***-Ez çawa dikarim biçim nexweşanê?***
***-Hûn dikarin vê navnîşanê bidin naskirin?***

2- Kesên ku pirsên wiha ji we bikin, bersivên rast bidin.

**Navên lehengên Kurdan ên li jêr di xaçepirsê de bibînin.**

Zîlan

Xebat

Viyan

Rustem

Egîd

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| e | î | s | o | w | i | r | z |
| | | | | | | | |
| g | e | e | h | e | d | u | î |
| î | o | m | a | n | ê | s | l |
| d | a | a | î | r | d | t | a |
| x | e | b | a | t | l | e | n |
| ş | ê | r | ê | j | c | m | e |
| n | r | t | z | r | o | t | t |
| e | î | r | o | a | y | û | n |
| v | i | y | a | n | n | n | n |

# DARA GÛZÊ

*Dara gûzê yek ji darên temendirêj* e. Dara gûzê bi sadênsalan dijî. Qasî 10-35 metreyan dirêj dibin.

Dara gûzê ji bilî fêkiyê wê yê xweş ku gûz e, ji dara wê gelek tiştên nav malê û amûrên weke, mêze, kursî, dolab û tenbûr jî tên çêkirin.

Gûzên wan payîzan digihîjin. Li gelek cihên Kurdistanê yên çiyayî çêdibin û xwedî berhem in.





# EM TÊBIGIHIN

1- Dara gûzêheta çend metreyan bilind dibe?
2- Gelo te dara gûzê dîtiye?
3- Di kîjan demsalê de gûz digihîjin?
4-Ji dara gûzê çi çêdibe?

# GULA DEVLIKEN

Di demekî de paşayek hebû. Ji wezîrê xwe re wiha ferman da:

- Hatina dû kesan li gel hev qedexe ye!

Wezir fermana paşa li kolan û kuçeyên welat belav kir.

Piştre fermana qedexekirina kenînê jî da. Li ser fermana paşa, ji tirsa êdî ti kes nedikeniya û nedibeşişî. Hemwelatiyan ken ji bîr kiribû. Her kes di nav hizir û bîrên tarî de dijiya.

Di wî welatî de keçeke biçûk û sêwî hebû.

Ew keçika çarenûsa wê reş, rojekî bê rawestan digirî. Dû dilop rondik ji çavên wê ketin nav axê. Ji wan rondikan kulîlkeke spî şîn bû. Kulîlk roj bi roj zêde bûn. Kesên ku li van kulîlkan dinêrî dilê wan tijî heskirin dibû.

Kulîlk her roj bi dengekî xweş “haa, haaa” dikeniya.

Keçika ciwan, ew kulîlk ji xwe re firotin. Welat bi tevahî tijî heskirin û ken bû.

Di dawiyê de ev kulîlk gihîşt destê paşa. Ew jî da kenandin. Bi qasî ku padîşah dikene, ew çend jî dest bi hizirînên baş dike. Tevahiya qedexeyan rakir. Hemû xirabî hatin jibîrkirin. Di çavê gel de bû padîşahekî baş.



## WATEYÊN PEYVAN

**Ferman:**Emir
**Beşişîn:**Girnijîn, beşişîn, devlikenî
**Sêwî:** Zarokênku dayîk yan bavêwan yan jî herdu tine.
**Çarenûs:**bext, qeder
**Rondik:**histirên çavan, firmêsk

## EM TÊBIGIHÎN

1- Padîşa di welatê xwe de çi qedexe kiribû?
2- Qedexeyan li welatiyan bandoreke çawa çêkiribû?
3- Kulîlka spî ya devliken çawa derket holê? Rê li ber çi vekir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Navên kulîlkên li jêr di nava hevokan de bi kar bînin. Wan hevokan li lênûsa xwe binivîsin.
***"Şîlan, nêrgiz, şilêr, sosin"***
2- Di hevoka li jêr de rengê kulîlkê çawaye?
"Ji wan rondikan kulîlkeke **spî** şîn bû."
*Vê hevokê li lênûsa xwe*

*binivîsin. Peyvên reng didin diyarkirin nişan bikin. Ji wan peyvan re **hevalnav** tê gotin.*

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Peyvên li jêr rast binivîsin**

**Evîn, jan, negirî, viyan**
**Delal, xemgîn, Wan, keştî**

# ÎKLO DÎKLO

Îklo dîklo
Dû nazir
Şepip rapip
Tutî zerî
Mamê siyê
Yêl bin biyê
Ew dîklokê
Çav spiyê
Xêçî mêçî
Kêçî mêçî
Qesra dû der
Çûyîme der
Elah û ekber

Gul im gula nizara
Ew tayîka çinara
Çinaroka xaxolî
Îmamoka Babilî
Babilî dê jin bînî
Em nadin, em nadin
Heta xirxirok badin
Xirxirok ji me dûr in
Wê li bin şetê Xabûr xatûnê

Şetvano, şetfiroşo
Hespê qemer dadoşo
Were bin dara zeytûnê
Selamû elêk pîra

Ho ho ho mihê
Sofyan berdan pê mihê
Heta ber Çemê Kerxê
Çemê Kerxê dirêj e
Sofyan li ser kir nimêj e
Çûm newalek têr guhêj
Sofyan li ser kir qîj wîj
Em sofiyên didan tîj
Te gûz an te mewîj
Min ewîj û min ewîj.



# ZAROK Û GUL

Zarokek biçûk bi tevahî pereyê xwe gulek ji gulfiroşekê kirî. Destmala xwe şil kir. Gula xwe xist nava destmalê, zû gihişt mal û gula xwe di hewşê de çand. Binê wê xepart û av da.

Zarok tevahiya şevê, xewn li ser gulê dîtin. Sibê zû rabû ranebû dît ku pelçimên gulê hişk bûne û weriyane binê wê. Dîsa binê wê kola û av da. Belê, ti pêşketin di gulê de çênebû.

Zarok bi rojan ev xebat berdewam kir lê ne gulê serê xwe ji nava axê hilda, ne jî zarok ji wê xebatê bêzar bû. Beyaniyekê dema zarok ji bo avdanê daket jêr, gulê serê xwe yê sor ji nava axê hildabû û bi wê dikenî.

Got:

- Roj baş!

Zarokê ji çav û guhê xwe bawer nekir. Dema pelê gula xwe ya sor dît, ewqas kêfxweş bibû ku!...

Got:

- Lê te ez pir mijûl kirim, dîsa jî min hêviya xwe ji te qut nekir. Belê te bi rojan serê xwe nişanê min neda.

Gulê bersiv da û got:

- Rast e. Belê ez dixwazim tû vê bizanî. Bextewariyên ku bi hêsanî tên bidestxistin, demdirêj nabin. Ji bo bextewariyê pêdivî bi kedeke gelek zêde heye.



## WATEYÊN PEYVAN

**Bextewer:** kêfxweşbûn, şadbûn, xoşbext.
**Ked:** Ji bo karek encam bigre hewldana ku tê dayîne.
**Xepar:** Kolandina ber qurmê şitil û daran.
**Weriyan:** weşîn

## EM TÊBIGIHIN

1-Çi tiştî zarok mijûl kir?
2- Di dawiyê de gulê xebata zarok bi çi xelat kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1-"***Zarok ji çav û guhên xwe bawer nekir***." Kîjan navên di hevokê de xwerû hatine nivîsandin?

*Ew navên ku ji yek peyvê pêk tên, pêşgir û paşgiran nagirin, jê re navên* ***xwerû*** *tê gotin.*

2- Benda destpêkê careke din bixwinin. -Di wê bendê de çend hevok hene?
-Tîpa destpêka hevokê, bi tîpeke çawa hatiye nivîsandin?
-Li dawiya hevokan çi hêma hatiye danîn?
-Di hevoka benda dawiya nivisînê de bêhnok li kûderê hatiye danîn?

# HÎNDARÎ

1- Ji bûyerên ku we kêfxweş dikin, yekê binivîsin.
2- Ji bo zû û rast xwendina mijarê bixebitin.
3- Ji dûrahiya di navbera pirtûk û çavên xwe de baldar bin.

# BIHAR

Baran barî şîn bû giya
Gul bişkivîn her aliya
Bû berîna berx û miya
Ma bihar hatî baniya?

Ava kaniya bû celal
Helî berfa kevyên delal
Keçên ciwanên çav bi xal
Bo biharê bûne heval

Guh bide qeb qeba kewan
Binêre rengê beybûnan
Ji dengê şivan û bêryan
Bizane zindî bû Cîhan



## EM TÊBIGIHIN

1-Di helbestê de tiştên hatina biharê diyar dikin çi ne?
2- Rêzika "***Gul bişkivîn her aliya***" şîrove bikin.
3

## DESTUREN ZIMAN

1- Di hevoka "***Mabihar hatî baniya***?" de ji ber nivîsîna peyva "***ma***" em dizanin ku pirsek hatiye kirin.

Ji wan gotinên pirs pê çêdibin re alavên pirsyarî tên gotin. Di dawiya her hevokeke pirsyarî de hêmaya pirsê (?) tê nivîsîn.

2- **"Piştî payîzê, kîjan demsal tê**?" Di hevokê de jî, peyva "***kîjan***"ê hevokê dike hevoka pirsyarî.

## HÎNDARÎ

1-Hûn pitir ji kîjan demsalê hez dikin? Li ser wê di refê de axaftinekê bikin û di dema axaftinê de van li ber çavan bigirin:

-Dema hûn taxivin vehêz bin, xwe neşidînin.
-Bi dengekî hemû kes bibihîse baxivin.
-Bi awayekî zelal û vek.irî bipeyvîn

2- Helbesteke xweş ku mamosta bijartiye, li lênûsa xwe binivîsin. Vê helbestê ji ber bikin û ji hevalên xwe re bibêjin.

# EHMEDÊXANÎ

Rojekê Ehmedê Xanî şeş keç û kurên Kurd, birin mala xwe. Mêvanperweriyeke mezin ji bo wan lidarxist. Piştre, di nav wan de rûnişt û wiha got:

“Ev gotinên min girîng in, hûn di dilê xwe de veşêrin. Hûn biçûk in, hûn geş in, bê derd û xem mezin dibin, dilîzin û dikenin. Ev dema dilgeşiyê ye. Eger hûn dixwazin herdem bextiyar bin û tucaran bêbext nebin, li du tiştan bigerin. Heskirinû xebat; kî ji we hes bike, jê hes bikin. Ji hevalên xwe hes bikin.

Bi şûn de hûn dê hînî hezkirina diya me gişan, Kurdistanê bibin.

Ya duyem jî bixebitin. Îro jî ji bo hînbûn û zanînê bixebitin. Da ku hûn di hêla dinyayê de bizanin, pêşve biçin.

Bibin hêja, serbest û serfiraz.

Dema hûn waneyên xwe baş dizanin, hûn dilê mamosteyên xwe xweş dikin û hûn jî geş dibin. Ji barekî giran rizgar dibin. Ev hertim wisa ye. Bixebitin da ku her dem dilê we xweş be.

Gava dilê mirov vehêsayî û bi ken be, ew mirov ti caran ne bextreş e.

Zarokên delal! Ez bi we bextiyar im. Ez dixwazim hûn jî, bi min dilxweş bibin. Da ku welat jî, bi heskirina me her dem şad be.”



## WATEYÊN PEYVAN

**Bêbext:**Bextreş
**Hêjabûn:** Binirxbûn
**Vehês:** Rihet

## EM TÊBIGIHÎN

1-Li gor mijarê zarok di kîjan demê de dijîn? 2-Ehmedê Xanî çi şîret li zarokan kir?
3-Dema hûn dixebitin, çima dilê mamosteyên we xweş dibe?
4-Hezkirina hevalan, mirov fêrî çi dike?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Hevokên li jêr, li lênûsên xwe binivîsin.

*-Ev gotinên min girîng in, hûn di dilê xwe de veşêrin. -Kî ji we hes bike, jê hes bikin.*

*-Bi şûn de hûn ê hînî heskirina diya me gişan Kurdistanê bibin.*

*-Ez bi we bextiyar im, ez dixwazim hûn jî, bi min dilxweş bibin, da ku welat jî, bi heskirina me her tim şad be.*

2-Çi têkilî di navbera wateya peyvên li jêr hatine nivîsîn de heye?

bext - bextiyar
xebat - xebatkar
dil - dildar
evîn - evîndar


# HÎNDARÎ

1-Ji kîjan tevgera we, mirov têdigihîje ku hûn ji hevalên xwe hez dikin?
2-Bextiyariyê bi çend hevokan bidin têgihandin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Peyvên li jêr, li lênûsa xwe bi awayekî rast bi hev ve binivîsin. Bi dest nivîsa xwehr, xebatên ji bo nivîsîna rast û spehî bikin.

*al, baş, cam, dûr, ol, fil, gul, hat, jiyan, kum, law, mûm, man, ode, pak, Rêzan, sûr, tav, wan, yek, sil*



# VEGERA LEGLEGAN

Bihar hatibû, derdor şîn bûbû; daran kulîlk dabûn. Li ber deriyê mala Serdar qurmek mezin ê dara biyê hebû. Dema legleg dihat, qurmê biyê zindî û şad dibû.

Sibehekê dayîka Serdar, bi dengê bilind got:

-Mizgînî, mizgînî! Legleg hatiye! Kurê xwe ji xewê şiyar kir. Serdar bezî ber kulekê. Di hêlîna li ser dara biyê de dû legleg hebûn. Bêhnekê temaşeyî leglegan kir, piştre, li dayîka xwe zivirî û jê pirsî:

-Dayê, çima payîzê legleg van deran berdidin û diçin? Ma evqas ked ne ziyan e?

Dayîk:

-Ma çi bikin kurê min? Zivistanê li van deran nikarin xwarinê peyda bikin.

Serdar:

-Eger wisa ye, bila li wan welatên germ ku diçinê, bi cih bibin.

Dayîk:

-Ji bo zêdebûn û hinek sedemên din tên van deran. Havînê ew der pir germ in. Çêlikên ji hêkan derdikevin, xwe li ber wê germahiyê nikarin bigirin. Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir tên dîtin. Legleg çêlikên xwe bi wan xwedî dikin.

Dema digihên vê derê, hêlînên xwe çêdikin. Piştre leglega mê hêkan dike û kurk dibe.



Dema têjik derdikevin, rojên destpêkê, dê û bavên wan, wan xwedî dikin. Bi salan e, ez temaşe dikim. Çêlikên leglegan,nikilên xwe ber bi jor ve vedikin û bê navber xwarinê dixwazin. Dayîkê gotinên xwe berdewam kir:

-Têr dixwin û mezin dibin. Per û baskên wan bi hêz dibin. Fêrî firînê dibin. Payîzê, bi dê û bavên xwe re derdikevin rêwîtiyeke dûr û dirêj.

## WATEYÊN PEYVAN

**Qurm:**Gewdeyê daran
**Kurk:**Qurp, qup, rûniştina balindeyan li ser hêkan.
**Bask:**Çeng, per

## EM TÊBIGIHÎN

1- Qurmê biyan li ber deriyê malê kengî zîndî û şad dibû?
2- Legleg payîzê diçin ku derê?
3- Legleg û çêlikên xwe bi çi xwedî dibin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Kîjan peyvên hevokên li jêr; hevokan dikin hevokên pirsyarî?

**-Ma evqas ked neziyan**e? **-Ma çi bikin kurê min? – Qey çi bikin kurê min?**

Van hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Peyvên wan dikin hevokên pirsê binê wan xêzik bikin.


2- "**Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir têndîtin**." Navên di vê hevokê de bibînin û nîşan bikin.

## HÎNDARÎ

1 - Di vê mijarê de, tiştên hûn li ser jiyana leglegan têgihiştin bi çend hevokan, li lênûsa xwe binivîsin.
2 - Mijarê ji mamosteyên xwe guhdarî bikin. Bi dengekî çawa dixwîne?
3 - Sê kes mijarê bixwînin. Yek agahdariyên di nivîsînê de, yek gotinên Serdar yek jî gotinên dayîka wî bixwînin.
4- Bêyî ku hûn li nivîsînê binêrin guhdarî hevalê xwe yê mijarê dixwîne, bikin.

# NEZANÎ

Ez biçûk bûm bê şivan bûm
Bê gel û kes ber dîwar bûm
Ji bo wilo ez nezan bûm



Dema bûm xort bi wêranî
Bûm gunehkar bargiranî
Ji bo wilo min bîr nanî

Va bûm kalê diranketî
Dikizkizim ka zanetî
Ji bo wê ez mam kêmketî

De şîreta min li we be
Arşek dibê divê hebe
Ji bo wek min bi we nebe


**Arşek Beravî**

# DAR

Dara ku di beyaniyekê de, weke bûkekê ji kulîlkan xemilandî xwe dide pêş. Ev guhertin, bêyî ku çav bibînin bi awayekî xwezayî tên holê. Kulîlkên daran bê ku mirov bibînin, vedibin. Di nav bêdengiyê de ji ava çiqilên xwe, ji bo jiyanê hatine amadekirin. Çiqilên daran di nav bêdengiyê de kulîlkan û pelên kesk vedikin. Piştî wê jî fêkiyên rengîn, ji çiqilan xwe berdidin jêr.

Di demsala zivistanê de, di bayekî pir hêdî de, tiştê herî deng jê tê, darên bêpel in. Di demsala biharê de, ba û bahozên di dehlan de ji hejandinê zêdetir mişîneke pir şîrîn tê bihîstin. Ew hejandina bihêz jî, ji bo fêkiyan ziyan e.

Kar di nav bêdengiyê de tê hizirîn; weke pelçimdayîn û fêkîgirtina daran.



## WATEYÊN PEYVAN

**Mişîn:**Xuşîn
**Bahoz:**Bayê gur, bayê bihêz
**Dehl:** Cihên dar û darên fêkiyan lê hatî çandin û avî.

## EM TÊBIGIHIN

1- Di biharan de guherîna daran çawa çêdibin?
2- Di demsala bihar û zivistanê de dar dengekî çawa derdixin?
3- Hevoka li dawiya mijarê binivîsin.

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Ji dara ku pelên wê tineyî re dibêjin dara bêpel.

Wekî hûn dibînin, li pêşiya peyva pel, pêveka “**bê”** hatiye zêdekirin. Hûn jî vê pêşpêvekê, li ser peyvên **“reng, deng, mal”** zêde bikin û di nav hevokekî de bikar bînin.

2- Di hevoka jêr de peyva „**kesk**‟ rengê pelçiman diyar dike.

*Dîsa di nav bêdengiyekê de wê pelçimên kesk vekin.*

*Peyva ku çawaniya pelçiman diyar dike, peyva „kesk e‟. Wek tê zanîn em ji van peyvên bi vî awayî re **hevalnav** dibêjin.*

3- Hûn jî, ji bo peyvên “**heval, dar, gul**” hevalnavekê peyda bikin û di nav hevokekê de bikar bînin.

## HÎNDARÎ

Bûyerek xwezayî ya çêbûyî ji bo hevalên xwe bêjin.

# TEST 4

**1 - Di hevoka “*Welatê me, bi bermayiyên dîrokî, çiya û avênxwe tên naskirin*” de çend bêhnok hatine bikaranîn?**

a) 3
b) 2
c) 4

**2 - Di hevokê de ji peyva kirina karekê didin diyarkirin re çi tê gotin?**

a) Hevalkar
b) Hevalnav
c) Kar

**3 - Dara Gûzê bi qasî çend metreyan dirêj dibin?**

a) 10-35
b) 53-55
c) 33-50

**4 - Ji peyvên ku rewşa navekî diyar dikin re çi tê gotin?**

a) Hevalnav
b) Nav
c) Cînav

**5 - Nivîskarê helbesta “NEZANÎ” kî ye?**

a) Ehmedê Xanî
b) Arşek Beravî
c) Cegerxwîn

# BEŞA 5

## MEHABAD





Ez bajarekî şirîn im
Ji dozê re evîn im
Gelek mêrxas û egîd
Mîr û gernas û reşîd
Li ser min hatin kuştin
Kovan di dil de hiştin
Bi xwîn xemlandî me ez
Serbilind im bi wan ez
Hêmin, Hejar û Qazî
Perwerandin bi nazî
Diya azadîxwazan
Rewşenbîr, helo, bazan
Xemla min e Çarçira
Tê de tev xwişk û bira
Rakir ala renge reng
Hemû yek dil û yek deng
Ey reqîb xwendin bi ceng
Bilind meqam û berjeng
Min deng veda cîhanê
Komara Kurdistanê

## WATEYÊN PEYVAN

**Doz:** Şop, rê, xet,
**Gernas:** Egîd, mêrxas
**Kovan:** Xemgîn
**Perwerandin:** Perwerdekirin
**Rewşenbîr:** Ronakbîr
**Helo:** Cureyeke teyran e, baz

## EM TÊBIGIHIN

1-Mahabad li kîjan parçê Kurdistanê ye?
2-Di helbestê de çi bû xemla Mahabadê?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di rêzika “**Rakir ala renge reng**” de birepeyva “**renge reng”** bandorek çawa li ser peyva “**alê**” dike? Em ji wan peyvên li pey nav tên û çawaniya nav didin diyarkirin re çi dibêjin?

“**Min pênûsa şîn da Evînê**”

Di hevoka jor de peyva **“şîn**” çawaniya “pênûsê” dide diyarkirin. Bi vê boneyê peyva “**şîn**”ê hevalnavê “pênûsê” ye.

## HÎNDARÎ

1- Helbestê bê deng, piştre jî bi dengekî bilind bixwînin. Heya hûn bi awayekî rast û bi wate dixwînin vî karê xwe bidomînin.
2- Helbestê ji ber bikin û li pêşiya refê bixwînin.

# XIFŞÊ

Xifşê karika askayekî pir ciwan bû. Wê şevê nû, ji dayîk bibû. Li cem dayîka xwe razayîbû. Kêvroşkek ji wirde hat û jê re got:

- Rabe Xifşika delal!

Xifşê karikeke pir zirav bû. Destpêkê çavekî, paşê jî yê din vekir. Dema xwest rabe ser lingên xwe, lerizî û ket.

Kêvroşk têr pê kenî.

Kêvroşk:

- Tû çiqas giyandareke şîrîn î!

Dema mirov li gel yeke weke te bijî, ti carî ji giyanê xwe bêzar nabe. Ma ne wisa ye? Xifşê bersiv neda. Gelek mandî (westîya) bû.

Kêvroşkê, zêde xem jê nexwar. Ji ber ku dizanî Xifşê, wê rojekê mezin bibe û bi wan re bibe heval.



Şevek li ser ji dayîkbûna Xifşê re derbas bû, fêrî rêve çûyînê bibû. Her tiştê ku didît bala wê dikişand û şaş dibû.
Kêvroşk jî, ji bo Xifşê dibû alîkar.
Kêvroşk:
-Ev lawir, navê wan kew in, çiqas xweşik in, ma ne wisa ye? Xifşê:
-Lê ev çi ye? Ma ev jî kew e?
Kêvroşk:
-Na, ev perperok e.
Xifşê:
-Perperok e!
Dubare kir û dema kulîlka sosin dît, digot qey ew jî perperok e.
Kêvroşk, gelek bi wê kenî û got:
-Tu dîsa şaş bûyî, ev kulîlk in.
Xifşê, dengekî pir ji hundirê xwe got:
-Nexwe, ji hemû kulîlkan re roj baş!
Her rojên ku derbas dibû, Xifşê di jiyana xwe de fêrî tiştên nû dibû. Di dawiyê de bû askayekî daristanê ya herî mezin û xweşik.

## WATEYÊN PEYVAN

**Xifş:** Karxezal
**Giyan**: Can, rawan
**Mandî:**Westan
**Aska:**xezal

## EM TÊBIGIHÎN

**1-Di mijarê de karika askayê çawa tê pênasekirin?**
**2-Kêvroşk çima bi xifşê kenî?**
**3-Çîrok li kûderê derbas dibe?**

## DESTÛRÊN ZIMAN

1 - Van peyvên li jêr li gorî rêzetîpan rêzbikin. **Xem- xweş- kew-kar-xezal-roj-xifşê.**

2 - Di zimanê Kurdî de “***tir***” û “***tirîn***” payeya di navbera heyînan de dipîve. Ji wan re **hevalnavê payepîv** tê gotin.

**Mînak:Sor-sortir-sortirîn**

## HÎNDARÎ

1 - Di televîzyonê de, bûyerên di navbera lawiran de derbas dibin, guhdarî û temaşe bikin. Di demê guhdarîkirin û temaşekirinê de li ser van xalan baldar bin:

-Di belge fîlm de kîjan lawir cih digirin?
-Taybetmendiyên lawirên di fîlm de cih digirin çi ne?
-Belge fîlmekî ku lawiran şîrove dike ji bo hevalê xwe bibêjin. -.

2 - Dema ku hûn mûzîkê guhdarî dikin an jî fîlman temaşe dikin, kesê bêzar nekin.

# MIJARA SERBEST

## RÛVÎ Û GUR

Hebû nebû ji Yezdan gewretir nebû. Dibêjin demekê roviyekî pir xwedî dek û dolab hebû. Sal çûn, dem derbas bûn, rûviyê fêlbaz, lawaz û nexweş bû. Beyaniyê zû li rex goleke avê, li nêçîrê digeriya. Ji nişkan ve gurekî birçî derket, êrîşî rûviyê nexweş kir ku wî bixwe. Rûviyê nexweş rûnişt û dest bi girî kir û got:

- Ez nakevim xema ku tu min bixwî! Bihêle, ez cara dawî kudikên xwe bibînim. Paşê tu min bixwî jî xem nake.

Gur ji rûvî pirsî û got:

- Ma tû vê beyaniya zû li ser vê gola sar çi dikî?

Rûvî got:

- Ez hatibûm nêçîra masiyan. Ev karek pir asayî ye, ez ê nîşanî te jî bidim. Heya ez biçim kudikê xwe bibînim û bêm, tû yê jî çend masiyan bigirî.

Gur:

- De zû nîşanî min bide, da ez jî çend masiyan bigirim.

Rûvî:

- Li ser keviya golê rûne. Dûvê xwe dirêjî nava avê bike.

Heya demekê masiyê bên û bi dûvê te ve daliqin. Dûvê xwe ji avê bikişîne. Çend masî wê bi dûvê te ve derkevin ser reşahiyê. Di wê demê de tû wê masiyên xweş û paqij bixwî.

Gur li ser keviya golê rûnişt û dûvê xwe weke rûvî gotî dirêjî nav golê kir, da ku masiyan bigire.

Ji rûvî re got:

- Here kudikên xwe bibîne û zû were!

Rûviyê fêlbaz jî ber bi gundekî têr kûçik ve çû. Xwe nîşanî kûçikên gund da. Kûçikên gund hemûyan bi bev re êrîşî rûvî kirin. Rûvî ber bi golê ve revî. Wê beyaniyê gelek sar bû. Gol qerisî bû. Dûvê gur jî di nav qerîsokê de asê ma bû. Rûvî silav li gur kir û got:

- Tû çi dikî mamê gur?


Gur:

- Tû dizanî, ez masîgir

im. Rûvî:

- Ma bavê te nêçîrvan bû. Ma bapîrê te nêçîrvan bû?

Şûna ku kuçik biçin rûvî, çavên wan li gur ket. Êrîşî gur kirin.



# ROJBÛNA RÊBER APO

Sala 1993‟an di civîneke ciwanan de, Serok wek taviya baranê ket nav pirsan. Di wê demê de mamosteyekê jê pirsî:

- Birêz Serokê min, roja dayîkbûna we me nedît. Me dixwest em wê rojê pîroz bikin.

Rêber APO bersiva vê pirsê neda. Berê xwe da dîrokzanê ku li rex wî rûniştî bû û got:

-Hûn bibêjin ez kengî ji dayîk bûme? Dîrokzan got:

- Di 27‟ê Mijdara 1978‟an de.

Rêber APO ji vê bersivê gelek dilşad bû û got:

- Belê, ev roja jidayîkbûna min e!



## WATEYÊN PEYVAN

**Civîn:**Kombûn
**Taviya baranê:**Barana ku ji nişkan ve bi gur tê û diraweste
**Dîrokzan**: Dîroknas. Kesê ku zanayê dîrokê ye.

## EM TÊBIGIHIN

1- Di civinê de li gel Rêber APO kî hebûn?
2- Mamosteyekê xwest, ji Rêber APO çi hîn bibe?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Li dawiya hevokên jêr kîjan hêma tên danîn?

***Xal (.) Pirsnîşan (?) Baneşan(!)***

**-Hûn bibêjin, ez kengî ji dayîk bûme. -Belê ev roja jidayikbûna min e**
**-Birêz Serokê min, me roja jidayikbûna we nedît**

## HÎNDARÎ

1- Li Cihê hûn lê dijîn, 4''ê Nîsanê bi çi awayî tê pîroz kirin?
2- Hinek gotinên Rêber APO li ser zarokan gotî, bibînin û ji bo hevalên bixwînin.

## MIJARA SERBEST

# BILBILÊN DI RIKEHAN DE

Rojek ji rojên payîzê bû. Pîremêrek di destê wî de gopal, hêdî hêdî di rê de diçû. Dît ku zarokek berbi wî ve tê. Di destê zarok de rikehek û di rikehê de, dû bilbil hebûn. Bilbilan rikeh didan ber nikilan û di bizava derketinê de bûn. Pîremêr, li ser vê rewşa bilbilan, pir dilteng bû. Piştre ji zarok pirsî:

- Tû yê ku ve biçî?

- Bazarê. Ez ê van bilbilan bifiroşim.

- Baş e, bifiroşe min. Nexwe ezê van bilbilan bikirim. Tû nafiroşî min?

- Belê, çima nefiroşim?

Pîremêr ji berîka êlekê xwe dirav derêxist û da destê zarok. Rikeh ji destê zarok girt. Destpêkê bilbilek ji rikehê derxist. Piştî bîstekê destê xwe li ser perên wê gerand û berda. Bilbil ji nişkan ve, çengê xwe vekir, bi şahî dest bi firînê kir. Heman tişt ji bo bilbilê duyem jî kir.



Li ser vê yekê zarokê biçûk matmayî bûbû. Zarok, carekê li diravê di destê xwe de, carekê jî li pîremêr nêrî û piştre jê pirsî:

- Çima te wisa kir, mamo? Çima te bilbil berdan? Pîremêr kenî û wiha bersiv da:

- Binêre lawê min, ji beriya çend salan şoreşeke çekdarî çêbû. Ji bo ku em welatê xwe, ji bin destên neyaran derxin, me şer dikir. Aha di wî şerî de, ez birîndar bûm û dîl ketim destê neyaran. Her wekî van çûkên di destê te de bûm. Ji bo ez rizgar bibim, min jî tim bizav dikir. Weke ku dilê min dixwest, min nedikarî tevbigerim. Dîlî û bindestî tişteke gelek zor û zehmet e!

Pir baş dizanim, pîremêr bi çavên xwe yên şil ev axaftina xwe berdewam kir.

- Tû zanî çima min bilbil serbest berdan? Ew ne çûkên rikehan in. Çawa dixwazin bila wisa bifirin. Dixwazin li ser çi danişin, bila danişin. Bila ji dîliyê rizgar bibin.

# KULÎLK

Dayîka min nexwendîbû. Lê xwediya hesteke erênî û zanînek pir mezin bû. Ev hesta erênî û zanîna xwe ji xwezayê girtibû. Hemû dayîkên cîhanê mirovên herî baş û pîroz in.

Rojekê min ji baxçe, kulîlkek çinî û ji bo dayîka xwe anîbû. Dayîka min pir dilşad bibû.

Dayîka min got:

- Ka em hinek kulîlkên din jî biçinin.


Em çûn nav baxçe. Kulîlkek nîşanî min da û got:

- Lê binêre lawê min, ev kulîlk çiqas xweşik e. Ev kulîlk jî giyandar in. Giyanê wan jî heye. Eger em jê bikin, wê rebenan bimirin. Her kulîlk bi tayê xwe ve xweşiktir radiwestin.

Li ber serê her kulîlkekê rawesta û ji min re got:

- Ger dilê te bigire, tû dikarî jê bikî.

Çi taybetiyên minyên baş hebin, ez hemû deyndarê dayîka xwe me.



## WATEYÊN PEYVAN

**Reben:**Belengaz, jar
**Giyan:**Can, rewan

## EM TÊBIGIHIN

1- Nivîskar, di benda mijarê ya yekem de, kîjan taybetmendiyên dayika xwe tîne ziman?
2- Zarok, rêz û viyana xwe di kîjan hevokan de, ji bo dayika xwe diyar dike?
3- Dayîkê li ser mijara kulîlkan, bi çi awayî kurê xwe şiyar kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Ji derveyî kulîlkan di baxçeyên malan de kîjan fêkî û bêzûrên dîtir tên çandin?
Di lênûsa xwe de fêkî û bêzûran bikin sergotar. Di bin van sergotaran de ew fêkî û bêzûrên hûn dizanin rêz bikin.
2- **"Sêyem", "min**", **"dayikên**" van peyvan di valehiyên jêr de bi cih bikin.
Refa............
Dayika .......
.......... cîhanê.

## HÎNDARÎ

1- Her dem em rêzdariyê ji bo dayîka xwe digirin. Sedemê vê çi ye? Bi çend hevokan bidin diyarkirin.
2- Li ser vê gotinê nivîsekê binivîsin. "**Her kulîlk bi tayê xwe vexweşik e.**"

# LEHÎ

Dîlan, ji malan kêmekê wê de, li rexa perava celalî ji bo xwe aşokê avê çêdikir. Ji aliyekî bi awaza xwe ya xweş, stran digotin. Ji celalî coya avê danî ser aşokê xwe.

Li esmanan germahiyeke demkurt hebû. Pelçimek ji daran nedihejiya. Dîlan ji nişka ve bêdeng bû. Dengekî pir kûr bihîst. Gurîna esmanan ji dûr dihat. Li serê çiyayê gundê Satê ewrên reş kom bibûn.

Dîlanê di dilê xwe de digot; “Xwezî baran nebariya, da lehî çênebûya!” Di wê demê de, li nav gund gengeşe hat bihîstin.

- Lêhî hat ha!.. Xwe bidin aliyekî!... Birevin!...

Dîlana hejar ji ber dengê lehiyê, dengê gundiyan nedibihîst.

Serê lehiyê hat dîtin. Di demeke kurt de Dîlan bin av bû. Dema avê Dîlan diherikand kevir li laşê wê diketin; dest û lingên wê jî, ji ber qafoyên daran giran dibûn. Her cara ku serê wê li ser avê diket, bêhna xwe vedida û dida ber qîran. Di navberekê de, ji dengê lehiyê zêdetir dengekî cuda bi ber guhê wê ket.

- Dîlan xwe bi darê ve bigire, xwe bavêje darê!

- Keça min, dilê min!

Dengê duwem, dengê dayika Dîlanê bû. Ew hêza wê ya belavbûyî, bi vî dengî komî ser hev bû. Dara ku li pêşberî wê bi zorê destekî xwe dirêj kir û dar girt.



Dayika wê got:

- Dîlan keça min darê bi hêz bigire. Keça min, berxwedanê bike!

Dîlanê hemû hêza xwe ser hev kom kir. Destê xwe dirêjî darê kir û dar girt. Xwe ji avê derxist. Bêhneke kûr kişand û ji avê derket. Rizgar bû.

## WATEYÊN PEYVAN

**Satê:** Gundekî girêdayî navçeya Geverê.
**Celal:** Cubarên biharê
**Lehî:**Herikîna ava zêde
**Qafo:**Qapo, gelaşên li ber lehiyê ku cihekî kom dibin.
**Awaz:** Dengê xwe, awayê gotina xweş.

## EM TÊBIGIHIN

1- Dîlanê li keviya celalî çi dikir?
2- Ji beriya ku lehî bê, guhertineke çawa li derdorê çêbû?
3- Dîlana ku li ber pêlên avê ketî, hêza xwe kengê û çawa komî ser hev kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Hevokên jêr, li lênûsa xwe binivîsin.

**-Destê xwe dirêjî darê kir.**

**-Gurîna esman ji dûr dihat.**

Di van hevokan de peyvên kar û bizavê didin diyarkirin kîjan in? Peyva ku em jê re dibêjîn **kar** di kûdera hevokê de cih digire?

## HÎNDARÎ

Bûyereke lehiyê an jî şewatê bînin ziman.

# XWENDIN



***Xwendin nebe kes naçe pêş,***
***Peyda dibin pir derd û êş,***
***Her dem dibin destê neyar,***
***Em dê bidin xwikî û bêş.***

***Her çi nexwendî rêncber e,***
***Yê ku bixwîne rêber e,***
***Her dem dinav xan û sera,***
***Serkare, ew ya serwer e.***

***Xwendin divê hem pir xebat,***
***Bo miletê Kurd û welat,***
***Kurdno ji xew rabin hemû,***
***Mizgîn li we roja me hat***

***Ev tac û şewq xwendine,***
***Ev dîn û dewlet xwendine,***
***Ev serbilindî xwendine,***
***Ev devlemendî xwendine.***

***Cegerxwîn***

## WATEYÊN PEYVAN

**Xwikî:** Bac,qemçûr
**Bêş:** Diravên serane ji gel tê stendin.
**Xan:** Avahî, mal.
**Serwer:** Rêber
**Tac:**Kumê serê qiral û qiralîçeyan

# ALÎKARÊN COTKARÊN ZINDÎ

Rojek ji rojên biharê bû. Di mêrgê de, hesp, ker, ga, çêlek û mî diçêriyan. Di navberekê de hemû hatin rex hev. Dihat zanîn ku giyayê vê mêrgê hêj ter û şîn bû. Hesp, beriya hemû lawiran mafê xwarina giya ji xwe re dît,hêriya û got:

- Yê ku jin, zilam û zarokan li ser pişta xwe digerîne, dibe bazarê û tîne, ma ne ez im? Dema ku karek lezgînî çêdibe ma min nabezînin?

Li ser wan gotinan heya ji kerê hat ziriya û got:

-Di vê derê de jî serdestî? Her roj li ser rêya di navbera gov û bazarê de temenê min tê mezaxtin. Ji malê re çi bê kirîn ez dikişînim. Birayê hesp! Ev jî ne bes e, carcar ceh û xwarina te jî bi min didin kişandin. Tû raweste, destpêkê ez vî giyayî tam bikim. Maf ê min e.

Ga, wekî ku bibêji çênabe, serê xwe yê mezin rakir û oriya:

- Dema ez hebim, dora xwarinê nabe ya we? Aboriya jin, zilam û zarokan li ser min e. Eger ez di zeviyan de nîr û haletê nekişînim; genim, ceh û zerzewat wê bê çandin? Ji ber vê çendê ez dibêjim xwarina vî giyayî mafê min e.

Çêlekê, bi çavên xwe yên mezin, tewş li hemûyan mêze kir. Ji devê wê gilêza weke benikê têran diket û got:

-Moooo. Şîrê ku jin, zilam û zarok vedixwin, ez didim. Ma tenê şîr? Nivîşk, penîr ji şîrê min çêdikin. Pêwîst e, destpêkê ez vî giyayî bixwim.

Dîk, mirîşk, pisîk, se û mî ji piştî demekê tevlî vê goftûgoya germ bûn. Her yekê digot sûdê min ji bo cotkarî zêdetir e.
Cotkar, li binê mêrgê rûniştî bû û li wan guhdarî dikir û got:



-Hûn hemû sûdên cuda cuda didin me. Ji ber vê ez we tevan xwedî dikim. Têra we tevan xwarin û cihê razanê jî heye. Hûn tev jî wekhev in.

Dilê hemû lawiran bi gotinên cotkar vehês bû û goftûgo bi dawî bû.

## WATEYÊN PEYVAN

**Mezaxtin:** Xerçkirin
**Zerzewat:** Bêzûr, şînatî
**Têr:** Ji bo barê hêstir, ker û hespan çuwalên bi rîs hatî çêkirin.
**Şihîn:**Hîrîna hêstir, mehîn û hespan
**Gov:** Xan, axur

## EM TÊBIGIHIN

1- Em çawa dizanin pêwîstiya cotkar bi hemû tebayan heye?
2- Çima hesp mafê xwarina giya ji xwe re didît?

## DESTÛRÊN ZIMAN

1- Navên li jêr **taybet** in, yan jî **giştî** ne? Çima?
***Çêlek, dar, cotkar, mirîşk***

2-"**Xwarina giya mafê min e.**" Di vê hevokê de peyva "**giya**" navekî giştî ye. Sedemê vê çi ye?
Ji ber ku gelek cûrên giya dide nasîn.

3- Di mijarê de çend bend cih digirin? Bend çawa hatine diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Hûn dixwazin di bêhndana havînê de çi bikin? Ji bo hevalên xwe bêjin.
2- Demeke xwe ya xweş we borandî, bi çend hevokan binivîsin.
3- Vê çîrokê zindî bikin.

# HEZKIRINADAYÎKÊ

Dû zarokên dayîkekê hebûn. Yê biçûk temenî wî pênc salî bû. Dema ku dayîkê hezkirina xwe nîşanî yê biçûk dida, zaroka din digot:

- Dayîka delal, tû nizanî ez çiqas ji te hes dikim. Belkî tû ewqas ji min hes nakî.

- Çima keça min?

-Ji ber ku zarokên te didu ne. Dilê te bi heskirina dû kesan lê dide. Lê min tenê dayîkek delal heye.



## WATEYÊN PEYVAN

**Delal:** Xweşik, spehî, ciwan, taze, rind

## EM TÊBIGIHIN

1-Çend zarokên dayîkê hene?
2-Çima zaroka mezin dihizirî ku dayîka wê ji wê kêmtir hes dike?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Di hevokên jêr de kîjan peyv çawaniya dayîkê diyar dike, bibînin.

"***Dayîka delal tu nizanî ez çiqas ji te hes dikim. Ji ber kuzarokê te dû ne***."

## HÎNDARÎ

1- Kesê ku yekem car hûn bibînin, pêwîst e hûn çawa xwe bidin naskirin?
2- Pêwîst e hûn kîjan pirsan jê bikin?
3- Pêwîst e hûn bersivên çawa bidin pirsan?

# KEW Û MIRÎŞK

Rûviyekî diholek kir stuyê xwe, li ber kuna xwe rawestiya. Li dihola xwe xist û got: “xeberek mezin... dîlaneke giran, lîstokên mişkan, şerê kîsoyan, stranên şalolan... Rabin! Vê rasthatiya dewlemend û rengîn winda nekin, werin werin...
(ding û ding... ding û ding) derbasbûna mirîşkan belaş e. Rabin... rabin!”

Kew û mirîşk li vî dengî rast hatin, kew ji mirîşkê re got: “Were, em derbasî vê dîlanê bibin, ji ber ku bê dirav e.” Gava derbas bûn, rûvî got: “de werin, de werin, ez we bixwim. Hûn ketin dava min.”

Kew û mirîşkê dest bi girî kirin û li ber rovî geriyan, gotin: “apê rûvî de li me bibore!”

Rûvî: “Îro xem nake, taştê û şîva min heye, ez ê sibê we bixwim.” Rûvî kevirek danî ber kuna xwe û çû gerê.

Kew û mirîşkê bi nikilên xwe kevir gêr kirin, derketin û reviyan. Wê carê mirîşkê ji kewê re got: “Êdî em nayên xapandin.” Her yekê berê xwe da lîsê xwe.



## WATEYÊN PEYVAN

**Dewlemend:**xwedî mal
**Lîs:** Lûs, cihê kew û mirîş li ser dirawestin

## EM TÊBIGIHIN

1- Kew û mirîşk ji ber çi derbasî dîlanê dibin?
2- Rûvî çima kew û mirîşkê naxwe?
3- Kew û mirîşk çawa ji destê rûvî rizgar bûn?

# TEST5

## *MIROVÊN BI TENDIRUST*

"Mirovên bi tendirust, xwedî hêz û daxwaz in. Asayî dihizirin û dixebitin. Mercê bextewariyê ya herî girîng, bedenekî tendirust e. Ji ber vê jî destûra bingehîn hêsanî tîmarbûn e, duyem li gorî pêwîstiya laş razan e, sêyem li ser paqijiyê baldarbûyîn e, ya çarem jî werzîşkirin e."

***(Herdu pirsên destpêkê yên li jêr, li gorî mijarê bibersivînin.)***

**1-Di bendê de kîjan hevoka li jêr derbas dibe?**

a)Mirovên bi tendirust, xwedî hêz û daxwaz in.

b)Bi taybetî mirovê nexweş.

c)Dilşadiya mirov bê tendirustî ye.

**2-Ji vebijêrkên li jêr kîjan mercê bedenekî bi tendirust e?**

a)Werzîşkirin b) Razana gelek c) Xwendina gelek

**3-Di hevoka "*Azad ji xew rabû.*"de kîjan peyv kar e?**

a) Azad b ) xew c) rabû

**4-Ji vebijêrkên li jêr kîjan, meha salê ya çarem e?**

a) Kanûn b) Adar c) Nîsan

**5- Li dawiya kîjan hevoka li jêr hêmaya pirsê tê bikaranîn?**

a) Min ew pirtûk xwendiye

b) Te kîjan pirtûk xwend

c) Ez ji xwendina pirtûkan pir hes dikim


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Nahcevan
Tirkiye
KURDISTAN
Iran
Suriye
Iraq
Lubnan
Derya Sipi
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Agri
Bazid
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Mus
Tetwan
Behra Wane
Wan
Qotur
Xoy
Eleziz
Elbistan
Meleti
Firat
Farqin
Bitlis
Basqale
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Meras
Besni
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Iskenderun
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam